

NAVEROK/İÇİNDEKİLER



Bergê pêşîn: ji çepê: Hatice Demir,
Qiraliça Swêdê Sîlvîya û Altûn Başaran
Foto: Rohat Alakom

- JI BÎRNEBÛNÊ 2
- NÛÇE / HABER 3
- QURSA ZIMANÊ KURDÎ 7
- NIVÎSANDINA KURDÎ NE EWQAS ZOR E! 8
- KURDÊN ANATOLIYA NAVÎN LÎ KOKA XWE DİGERIN 16
- BI MINASEBETA BÎRANÎNA SEDSALÎYA CÎGERXWÎN
HEVPEYVÎNEK BI HANEFÎ CELEPLÎ RE 24
- FOLKLOR 32
- AVAKIRINA LOBÎYAN 34
- FIROŞERÊ ŞEVÊ* 36
- DÎK Û ZÊR 38
- HELBEST 42
- „KÎ HÊLÎNÊ ÇÊDİKE?“ 45
- NAN Û EKMEK 53
- ”FITTJA WELATÊ MIN E” 55
- DÎLÊN ŞİKESTÎ 58
- STRANÊN FOLKLORÎK 63
- ŞECERA MALEKE KURDÊN POLATLIYÊ 65
- TÊRİKAN AŞİRETİ ÜZERİNE 71
- AZ KİTAP, ÇOK ŞİVE 75
- CELİKAN VAKFI BAŞKANI İLE BİR BULUŞMA 77
- ÖZGÜRLÜK SEVİNCİ 80



Xwendevanên bi birêz, em careka din bi hejmarê 20an ve bi hev re ne. Di dîroka kovareka "li xerîbîyê" wek Bîrnebûnê, ewqas ne hêsan e. Lê, bi hevkarîya derûdorên dostên kovarê û bi taybetî jî piştgiriya xwendevanên kovarê, em dikarin bêjin ku me karibû wî karî bi rihetî heta vê rojê binin. Daxwaz û hêviya me ev e; ku ew kovar û yê din jî bi hejmarên nû û piralî bikaribin bijîn. Dîroka me kurdan pêwîstiya xwe bi karên weng heye. Ya ku li me tê xwestin jî divê ev kar hîn bi rêk û pêk, bêt meşandin.

Xwendevanên bi rûmet, di van bîst hejmaran de, li gor îmkân û zanistîya me pir hindêk be jî, ji dîrok, folklor û kultura me, hinek nimûne ji mîrasa kultura xelkê me hat berhevkerin û belav kirin.

Di van bîst hejmaran de, ji dema me ya nû jî hinek nivîsên dîrokî û civakî, bi kêmasî bin jî, hatin nivîsandin.

Hêviya me ji xwendevan, heval û dostên kovarê ew e; ew kesên dikarin van kêmasî an jî çewtîyên ku hatine belav kirin, bi rexne û serrastkirinên xwe, me agahdar bikin. Dakû em jî bikaribin ew karê ku heta niha hatiye kirin, hem berçav bikin û hem jî karê kovarê hîn baştir bimeşînin.

Dîtin û rexneyên we di berçavkirina xebata kovarê de, dê alîkariyeka bê hempa be. Kovar bi van dîtin û rexneyên ku bîn, dê hîn bi rêk û pêk derkeve.

Di vê hejmarê de piraniya nivîsan bi kurdî ne. Ev yeka ne ku tenê dilê me dixwaze, ji ber ku nivîsên ji nivîskarên

me yê nû tîn, pîraniya wan bi kurdî ne. Helbet ew tiştêkî dilşahîyê ye. Nişana daxwaza xwedî derketina ziman e. Di xebatên li pêşîya me de helbet ew kara dê hîn jî pêşkeve.

Hûn dê di vê hejmarê de hinek ji berhemên qursa zimanê kurdî ku li Swêdê, tenê jinên kurd çûbûn bibînin. Ew, di demeke pir hindik de, xwendin û nivîsandina kurdî fêrbûn. Bi sernivîsa *Nivîsandina kurdî ne ewqas zor e*, ji berhemên jinên ku çûbûn vê qursa zimanê kurdî, bixwînin.

Rohat Alakom di mehên biharê de çûbû Anatoliya Navîn, li gund û bajarên ku kurd lê dimînin geriyabû. Hûn dê gernama birêz Rohat Alakom ya bi navê *Kurdên Anatoliya Navîn li koka xwe digerin* bixwînin.

Bi minasebeta bîranîna sed saliya Cîgerxwîn hevpeyvînek bi Hanefî Ceblî re hatiye kirin. Hanefî yek ji wan kesên ku li Swêdê herî pir Seydayê Cîgerxwîn naskirîye û dema Cîgerxwîn çû ser heqîya xwe, bi cenazeyê Seydayê Cîgerxwîn re çû Kurdistanê.

Di vê hejmarê de hûn dê nivîsên ji navên nû; Raşit Karakuyu, Elmas Yıldırım, Bahtiyar Yıldırım, Guldane Bal, Esmâ Karakaya, Necla, Yusuf Topal, Efe Apaydın, Kemal Harımcı, G. Kiliçkaya û Necatî Kanoğlu bixwînin.

Dîsan jî folklor, çand û edebiyata kurdî berhemên nu di wê hejmarê de jî hatine belav kirin. Bi hêviya ku li gor dilê we be, heta hejmareke din, di xêr û xweşiyê de bin...

Pêşengeha Kurdên Anatoliya Navîn



Rêber Ayşe Güler di pêşengehê de, derbarê Kurdên Anatoliya Navîn de agahdariyê dide qiralîça Swêdê, Xatûn Silviya

Di rojên 5-6/4.2003 pêşengeheke bi navê *Welatê ku roj jê hiltê* li taxeke Stockholmê, ya bi navê Fittjayê vebû. Ev cara pêşin bû ku derbarê kurdan de pêşengeheke waha profesyonel li Stockholmê dihate bi dar xistin. Kovara Bîrnebûn û *Navenda Pirkultur (Mångkulturellt centrum)* di warê rêz-kirin, raxistin û pêşkêşkirina vê pêşengehê de alikarike mezin nîşan dan. Wusan jî komeke jinên kurd wek Ayşe Güler, Altun Başaran, Hatice Demir û Gurbet Uzunel kedeke mezin di amadekirina pêşengeha Kurdên Anatoliya Navîn de serf kirin.

Pêşengeh di roja 5/4-2003 de ji aliyê

Qiralîça Swêdê, Xatûn Silviya da hate vekirin. Ev cara pêşin bû Xatûn Silviya di xebateke kurdan de beşdar dibû. Qasî 20 deqîkeyan cihê pêşengeha kurdan geriya û derbarê kurdan de ji berpîrsên pêşengehê agahdarî wergirt. Gelek sûretên Silviya bi keçên kurd ve hatin kişandin û di medya Swêdê de hatin weşandin.

Pêşengeh li taxa Fittjayê, di lokal-ke nûçekirî de vebû. Çawa tê zanin li vê taxa Stockholmê bi hezaran kurdên Anatoliya Navîn dijîn, wek paytextê wan tê nasîn. Piraniya gundê Omera (Tavşançalı) li Fittjayê dijîn. Bi sedan nimûneyên çanda Kurdên Anatoliya

Navîn di vê pêşengehê de hatin nîşandin. Piraniya van materiyalan tiştên etnografîk bûn. Hin ji wan ji welat hatibûn, wek kulavekî şivanan ku gelek bala temaşekaran dikşand. Kincên kurdan, xemlên mala kurdan, sûretên kevn û gelek tiştên mayin hatin pêşkêş kirin. Ji bo zarokan quncikekî bi navê *Quncikê Zarokan* hatibû vekirin. Di vî Quncikî de çîrokên kurdî dihatin xwandin. Di roja vekirina pêşengehê zarokên kurd di saloneke mayin de lîstikên Anatoliya Navîn pêşkêşî swêdiyan û mêvanên mayin kirin.

Di roja 6/4. 2003 an de di saloneke

mayin de nimûneyên folklor û çanda Kurdên Anatoliya Navîn hate pêşkêş kirin. Ji 100 zêdetir mêvan hatibûn. Folklorazarokên Kurdên Anatoliyê gelek bala mêvanan kişand. Hunermendê vê deverê Şahan Atçi bi henek, laqirdî û yariyên xwe ve seatekê zêdetir guhdarên xwe dan kenandinê.

Ji aliyê din di dema vê pêşengehê de Seyfî Dogan di derbarê zimanê kurdî de semînerek pêşkêş kir.

Ev pêşengeh heta 18ê Gulanê vekirî ma. Derbarê vê pêşengehê de di rojname û kovarên Swêdê yê cihêreng de çend nivîs û sûret hatin weşandin.

Kokteylek li Weşanxana Apecê

11.4.2003an de li Weşanxaneyê Apecê ji ber derketina pirtûka Rohat Alakom ya derbarê Kurdên Anatoliya Navîn de, kokteylek hate bi dar xistin. Qasî 50 kes tevî kokteylê bûn. Nivîskar Rohat Alakom bi kurtî di derbarê amadekirina vê xebata xwe û naveroka wê de çend dîtinên xwe pêşkêşî guhdaran kirin. Paşê nivîskar bersivên çend pirsên xwendevanan da û pirtûkên xwe îmza kirin. Di kokteylê de hin xwarinên kurdî yê sivik hatin pêşkêş kirin. Pirtûk bi navê *Li rohilatê hertim roj hilnayê – Kurdên Anatoliya Navîn* der çûye. Di nav rûpelên vê lêkolînê de hin sûretên kevn yê ji vê deverê jî cîh girtine.



Rohat Alakom dema pirtûka xwe pêşkêş dika

Civîneke kovara Bîrnebûnê li Baselê



Hin beşdarên civînê

Di roja 3/5. 2003 an de li bajarê Baselê derbarê kovara Bîrnebûnê de civîneke agahdariyê û hevnasîni pêk hat. Ji redaksiyona Bîrnebûnê Nuh Ateş, Mehmet Bayrak, Muzaffer Özgür, ji Komela Ziman, Yusuf Polat, Kemal Harımcı tevî vê civînê bûn.

Qasî 30 xwendevan ji deverên cihê yê Swîsrê di civînê de beşdar bûn. Endamên redaksiyonê derbarê xebatên kovarê, pirsgirêk û armancên kovarê de dîtinên xwe pêşkêşî xwendevanan kirin. Berpîrsên Komela Ziman jî derbarê komela xwe de qala hin babetan kirin.

Beşa duwemîn ya civînê wek sohbetekê derbas bû. Xwendevanan him ge-

lek pîrs ji berpîrsên kovara Bîrnebûnê kirin û him jî dîtinên xwe pêşkêşî guhdaran kirin. Xwendevanan bi taybetî derbarê belavkirina kovarê, naveroka wê û derbarê başkirina kovarê de pêşneyar, dîtin û ramanên xwe gotin. Hin xwendevanan dîyar kir ku li Swîsrê gelek kurd dijîn û divê ev kurdan bi teherkî bî bal hev, bibin hêzekê û divê sazgehên xwe yê netewî pêk bînin. Di vê babetê de beşdaran tecrîbeyên xwe rabeî hev kirin. Di navbera wan de dan û standînen gelek bi kêrhatî pêk hatin.

Di dawîya civînê de komîteyeke ji 5 kesan hat hilbijartin. Ev kesan wê ji bo xebatên rojê pêş kar bike û pêwendîyan pêk bîne.

Şeva Vaqfa Gundê Celikan

Çawa tê zanîn li Danmarkê bi navê Vaqfa Gundê Celikan (Yeşilyurt) rêxistinek hatiye saz kirin. Ev vaqfa belkî jî vaqfa pêşin ku ji aliyê ahaliyê gundekî Anatoliyê ve li Danmarkayê hatiye saz kirin. Endamên Vaqfa Gundê Celikan (Yeşilyurt) di terîxa 20/4. 2003an de li Danmarkê şevê amade kirin. Endamên vaqfê di şevê de hatin ba hev û ji xwe re heta derengî kêf kirin.

Di vekirina şevê de berpîrs û endamên komîta rêvabirina vaqfê derbarê kar û xebat û armancên vaqfê de beşdarên şevê agahdar kirin. Paşê ci-

wanên gund çend lîstikên folklorîk pêşkêşî mêvanan kirin.

Kesên ku hatibûne şevê ne tenê ji Danmarkê, ji welatên din jî hatibûn. Koma muzîkê ya gundê Celikan û hûnermend Murad di şevê de beşdar bûn. Çend mêvan û endaman jî hin klam û stranên vê deverê gotin.

Di dawîya şevê de ji bo vaqfê alîkarî hate berev kirin. Ew xelatên ku dewlemendên gund ji vaqfê re pêşkêş kiribûn, di dawîya şevê de ji bo vaqfê hatin firotin.

Fuara pirtûkan li bajarê Kolnê

Di navbera rojên 6-8/6.2003 an de li bajarê Kolnê bi minasebeta 100 saliya rojbûyina helbestvanê kurd Cigerxwîn fuareke pirtûkên kurdî hate vekirin. Fuar ji aliyê Komkar de hatibû amade kirin. Di fuarê de hin nivîskar û xwendevanên kurd gihiştin hev û nasiya xwe dan hev. Balyozxana Tirkîyê li dijî vebûna vê fuara pirtûkên kurdî derket, lê belê serneketin û fuar wek hatibû plankirin wusan qediya. Di fuarê de gelek weşanxanên kurd beşdar bûn, wek mîsal Apec, Doz, Deng, Nûdem, Sara, Özge, Roja Nu, Hevîbûn, Pelda, Vate. Di roja pêşin de qasî 250 kes beşdar bûn. Fettah Timar, Melîk Firat, Zerdeş Heco û Elî Çiftçî di fuarê de qise kirin. Hemûyan hewcedariya xebatên

waha kirin û hêvîdarbûna xwe pêşkêş kirin. Gelek kes wek Elî Qazî, Yaşar Kaya, Hesenê Metê, Firat Cewerî, Necdet Buldan, Goran Candan, Eskerê Boyik, Nazif Telek, Seyitxan Anter di fuarê de beşdar bûn.

Koma Dîlan, Koma Nemrûd û ji hûnermendan; Fatê, Zibêr Usif, Sedat Karataş ji folklor û muzîka kurdî hin perçe pêşkêş kirin.

Kovara Bîrnebûn jî di fuarê de beşdar bû û hate belav kirin. Berpîrsê Bîrnebûnê û xweyê Weşanxana Apecê Elî Çiftçî jî tevî vê fuarê bû û di fuarê de axaftinek kir. Bi vî tehrî Kurdên Anatoliya Navîn di vê fuarê de îmkana nasandina çanda xwe dîtin.

Qursa Zimanê Kurdî



Şagirtên qursê bi mamosteyê xwe Ekrem Altun re

Payiz bû. Li taxa Fittja em 9 jinên kurd geştin hev û me ew xeyala di dilê xwe da ani cih. Daxwaziya me fêrbuna xwendin û nivisandina zimanê me bû. Em gişt bi zimanê swêdi û tirki dipeyivin û dinivisin. Bes hertim alikî me kê m bû. Beî mazeret tunebûna imkanan bû. Îro li Swêdê zêdetir imkanên me hene ku em bi zimanê xwe bipeyivin û binivisin. Ziman ne tenê wasita danûstandinê ye û ifadekirina his û ramanan e. Divê mirow bikaribe xwe bi nivîsê ve jî xwe ifade bike. Ziman jiyandina kultura milletan e. Gava me dest bi vê qursê kir ew çirok û stranên me yên kevn û manîdar ku me ji za-

roktîya xwe de ji dapîr û bapirên xwe guhdar kiribûn, nivîsîn. Her yek ji me bû niviskarekê. Me bi çoşeke mezin dest bi nivîsê kir. Ew dewlemendiyek bi serê xwe ye. Divê em jinên kurd bipeyitinin ku, mirov bixwaze her tişt mumkun e. Hertim mirov serkefti be, baweriya xwe jî pêşta diçe.

Di vê qursê da em bi giştî li ser ziman û gramatikê sekinîn. Weki din li ser dîrok û edebiyata kurdan jî agahdar bûn. Em hêvidar in, qursa me piştî havinê jî berdevam bike. Yên ku dixwazin beşdarî qursa me bin, dikarin bi kovara Birnebûn re têkiliyan daynin.

NIVÎSANDINA KURDÎ NE EWQAS ZOR E!

Beşdarên Qursa Zimanê Kurdî li jêr tecribeyên xwe yê nivîskarêyê cara pêşîn pêşkêş dikin. Çawa tê zanîn ev qursa li taxa Fiitjayê sala par hatibû vekirin û qasî deh jinên Kurd yê Anatoliya Navîn tevî vê qursê bibûn. Li jêr ji hewldayinên wan yê pêşîn çend nimûne:

Ayse Guler 1

030205

SERINC DANÊK JI KONFERANSA NYNÄSHAMNÊ

Berî du heftan yekîtiya jinan, bi navê rojên perwerdekirinê konferansêk ji bo jinên kurd pêkanî bû. Ez û çend hevalên din beşdarî vê konferansê bûn. Ez dixwazim bi kurtasî çêlî vê konferansê bikim. Em li Nynäshamn bûn. Me roja şemiyê dest pê kir û roja yekşemê teva kir. Bi qasî 70 jin beşdarî vê konferansê bibûn. Gelek mijarên cuda hebûn. Peyiver li ser çand, sazkirina rêxistinên û nexwşiya hepatit-B peyivîn û em agahdar û serwest kirin. Ya ji bo min balkêş ew bû ku hemû peyiver bi zimanê kurdî dipeyivîn. Min qet tu carî ewqas agahdarî bi zimanê kurdî guhdar ne kiri bû. Bi taybetî jî, rewîştzaneke (behaviorist) jin, ji Uppsala hati bû. Ew peyivera ha gelek jîr bû. Tiştên wê hanîn ziman pîr seyr bûn. Bi giştî ji bo ciwaka swêdî û bi taybetî jî ji bo kurdan gelek tiştên balkêş hanîn ziman. Bi gelemperî li ser kulturên cuda, namûs, cinayet û wezîfeyên dê û bavên peyivîn. Ez dikarim bêjim ku min ji vê konferansê sudeke giranbuha wergirt.

Ayse Guler 2

030219

MEŞA AŞITIYÊ

15ê sibatê li Stockholm meşa aşitiyê hebû. Armanca vê meşê protestokirina şerxwaziya Amerîka ya li Iraqê bû.

Wê rojê li gelek bajarên Awrûpa meş pêk hati bûn. Bi hezaran mirov li kolanan dijî polîtîka Amerîka meşiyên. Ez û çend hevalên din beşdarî vê meşê bûn. 35 hezar mirov bi çêşeke mezin, pêşî li Norrabantorgetê gehîştin hev, dûra heta Djurgårdenê meşiyên û protestoya xwe li ber sefaretxana amerîkî domandin û paşê belav bûn. Meşeke wusan bîrewer di dîrokê da carekê ji bona şerê Vietnamê hati bû amadekirin. Di vî şerî de gelek berjewendiyên dewletan hene. Yek ji hevalbendên Amerîka, Turkiye ye. Vê bûyerê qetlîama (qirana) Halepçe xiste bîra min.

Bi hezaran mirov hatin kuştin û penaber bûn. Wê gavê jî çekên di dest Saddam da pîr giran û bitesîr bûn. Bes wê demê Amerîka û dewletên din bédeng man, bas lê ne kirin. Ji vê dixuye ku berjewendiyên dewletan roleke pîr mezin dilîze û qedera xelkê Rohilata Navîn di dest wan da ye. Ji bona wan petrola Musil, Kerkûk û Silêmaniyê ji jiyana mirovan hîn giranbuhatir e.

Elmas Yildirim 1

030124

MIN ROJA DUŞEMÊ ÇI KIR

Duşem e, saet nehê sibehê ye. Bi dengê telefonê rabûm ku ew dîya min e, ji min navnîşana cîranê xwe yê Konyê dixwaze. Min bi dîya xwe ra deh deqan deng kir. Ez hema rabûm ser xwe, çûm aşxanê, min çayek da ser û xwarina xwe çêkir. Li ser sifrê min di pencerê re li derva mêze kir ku berf dibare û hewa sar e. Çavê min bi salnama dîwêr ket ku ez ê hîro herime ba dixtorê xwe. Min bi lez û bez kincên xwe li xwe kirin û ji mal derketim. Hema li tirênê siwar bûm û çûm nexweşxana bajêr. Ez xwe bextiyar hîs dikim ku îro li vir bi kurdî dinivîsim. Ev ji bo min tiştekî pir mezin e.

Elmas Yildirim 2

030219

ÎDA QURBANÊ

Hersal li îdan em li mala bav û dêya xwe dicivin. Li Swêd tu qurban serjê nakin, goşt ji dukanan dikirin. Sibê zû ez çûm ba dêya xwe, me goştê qurbanê da ser êr û sofraya amade kir. Bav û birên min ji nimêja îdê hatin, me bi dilşadiyekê îda xwe pev ra pîroz kir. Paşê pir mêvan hatin. Me ji mêvanan ra ezm û îkram kir. Ez bi xwe jî çûme mêvandariyê. Dêya min qala îdên berê dikir û digot "berê qurban dixemilandin û xwîna heywanan di heniya zarokan didan". Tiştek hate bîra min. Wexta ez bi dergistî bûm, li îda qurbanê xwesiya min ji min ra beranek xemiland û zêrekî mezîng bi stûyê wî va kir, ranê wî reng bi reng boyax kir û wunand li ber deriyê mala bavê min bi serjêkirin da û xwîna qurbanê di heniya min dan. Ez şaş bûm ku çî bêjim. Berê îda qurbanê li welat di nav kultura me da weng derbas dibû. Nuha ez naxwazim ku tu qurban bîn serjêkirin

Elmas Yildirim 3

030210

ÇIROK

Çi hebû çî tunebû, carek ji caran, rehme li dê û bavên guhdaran. Zemanê herbê ye. Rojekê ji rojan gemîk tê peravê deryayê. Jê xortekî jar, porzer û çavkusk peya dibe. Dora salekê ye ku ew di vê gemiyê (keştî) de maye. Lêwik got:

–Qaptan tu heqê xwe li min helal ke.

Qaptan lê vegerand, gotê:

–De here lawê min, oxira te ya xêrê be, Xweda karê te li hev bîne, lê ji bîr meke ku tu xiristyan û topal (kulek) î. Bila ev şorên min ji te ra guhar be, bi guhekî xwe ve ke.

Lawik dipirse:

– Qaptan va dera ku der e?

Qaptan gotê:

–Vira sînorê Turkiyê ye, navê vir Çeneqale ye.

Keştî giran giran ji lêmanê dûr dikeve. Rojêke germ e, tî bûye, tirs dikeve dilê wî. Li peravê deryayê xwe dirêj dike û hema dikeve xew. Bi ewtîna kûçikekî bi xwe dihese ku êvar e. Him tî, him birçî bû, xew ne dikete çavê wî. Hetanî sibê li doralîyê xwe mêze dike, lê kesî nabîne. Sibê zû li ser rawesteka keştîgehê du jendirme dibîne, nêzîkî wan dibê û dipirse:

– Gundê nêzik ji vir çiqas dûr e?

Jendirme dibêjin:

–Li paş vî çiyayî ye.

Lawik çiya bi çiya li gund gerî, dorî nîvro nêzîkî gundekî bû. Xaniyên vî gundî pir kevn û nizm bûn. Li derva mêr û jin rûniştî bûn. Lawik dît ku rûyê meriyên gund pan û çavên wan piçûk in. Bi tirs û xof nêzîkî wan bû. Yekî destê xwe heyinad û gotê:

– Tu bi xêr hatî, were xwe bi vir de. Şûnek bi mêrik mêrand (nemand) û ew rûnişt.

Çavên giştikan li wî bûn.

Mêrik got:

– Xorto, tu ji ku yî, li vir çi digerî?

Lawik got:

– Ez bulxar im. Li karekî û cihekî digerim. Mêrik got, aha tu gawur î. Lawik serê xwe danî û got:

– Te çing minasîb dîye axa.

Mêrik got:

– Ev gundê tataran e. Ez jî axê vî gundî me. Ji min ra xizmetkarekî ku heywan û hespên min biçêrîne, lazim e. Lawik neçar û westî bû, hema qebûl kir, da pey axê. Hatin ber qonaxa axê, derî baxçê. Lawikê axê derî vekir, got, ev kurikê pîs kî ye? Axê got:

– Banî dayika xwe ke. Ji derî jineke qût, qelew û ruhteng ber bi wan ve hat.

Axa got:

– Selvî, ev xizmetkarê me ye, ew ê ji me ra bişuxile.

Selvî ji mêrê xwe ra got:

– Tu musulman î, îşê vî kurikê pîs li vir çi ye. Axa bi hêrs got:

– Tu nexweş î, deng meke, here ! Axa li pêş lawik dawesta, xaniyekî piçûk pê nimand; eh, tu ê li wir bimînî. Tu ê sibehan zû rabî hespê min av bidî, bibe çiyayê paş gund, li peravê deryayê biçêrîne heta êvare. Gotineke min û te heye ku tu nêzîkî mala min û kurikê min nebî, ji keçîka min dûr dawestî. Şorên mala min li nav gund belay bibe, ez ê te bikujim. Lawik serê xwe berjêr kir û deng ne kir. Paşê la-
vikê axa nanekî tenûrê bi parçek goşt ve wunand, avête ber wî û çû. Heta sibê xew ne kete çavê wî. Di serê xwe ra, jin, lawik û keça axê bîr û anî. Mereqa wî keçîka axê bû. Çima axê nexwest ku ew nêzîkî keçîkê û nêzîkî mala wî nebe. Bayê sibehê sar bû, kincên lêwik tenik bûn ew tê da diqefilî; meşî çû ser bîrê. Ava bîrê jî sar bû. Lawik serê xwe heyina ku li hember wî keçîka axê dawestiyaye; porê xwe zer, sifate xwe mina rojê û çavên xwe mîna moriyên hêşin dibiriqin. Xwêziya wî di ber da ma, nizanî bû bêje çi; şewqa keçîkê ew germ kiri bû. Keçîka axê gotê:

–Tu bi xêr hatî, navê min Emîne ye. Ez bi te ra avê ji bîrê bikişînim û hespan av bidim?

Lawik tu deng ne kir, hesp av dan. Keçîka axê bang hespekî kir, got:

– Hesen were û li hespê nişt. Îşaret da lawik, got, tu di pey min were.

Lawik mit û mat ma, hema li hespekî siwar bû û hespên din jî heynandin, da pey

keçika axê. Ew nêzikî peravê deryayê bû bûn. Emine ber bi wî ve hat, got, ji min pêve kes li Hesên siwar nabe, tu vê bizani be ha! Lawik serê xwe deynand û newêrî bû li wê binere, heta ku Emîne ji wir dûr ket. Lawik destê xwe ber bi jor da heyinand û got:

– Xwedê, te ji min ra ferîşteyek şand, ma ew pir bijîn e. Berî nuha bi hefteyekê lawik bi tenê diçû û dihat. Dora dina rojê Emînê nanê lawik wunand. Li peravê deryayê dawistî, kincên xwe êxistin (derxistin) û xwe avête deryayê. Bang lêwîk kir. Hema gotina axê hatî bîra wî, xwe bi şûn va da. Emine got ku eger tu ne hatî, ez ê ji bavê xwe ra bêm ku te li min zulm kir, bavê min ê te xiş ke. Lawik ji xwe di dilê xwe da dixwest ku bi Emînê ra bimîne. Li doralîyê xwe nêrî ku kes tune, hema xwe avête deryayê û bi Emine ra lîst û ew tevî hev bûn. Emînê navê wî pîrsî, lawik go, navê min Îsa ye. Emîne bi lez kincên xwe li xwe kir û çû mal. Îsa û Emîne heroj bi hev ra hesp av didan. Rojêkê axa hate ser bîrê û got:

– Gawur, tu ê ji vir û bi şûn da, bi min ra werî ser zewîyan, em ê cot bikin û Emine jî ê li hespan binere. Agir kete dilê Îsa û ji mecbûrî, qebûl kir. Li dora mehekê ew çûn ser zewîyan û hatin. Lê dilê wî û çavê wî tim û tim li Emîne bû. Axa û Îsa dema êvarê hatin mal, axê gotê:

– Tu pir westiyayî, were, van pênc qayiman heyne, here bajêr û bi kêfa xwe bigere. Ez îro li bajêr bûm. Tu ciwan î, dilê te wê helbet gerê bixwaze. Emînê şora bavê xwe bihîst. Ruhteng bû, deriyê malê li xwe girt. Îsa pir kêfxweş bû, hema li hespekî siwar bû, çû bajêr. Siftê (pêşî) zikê xwe têr kir, pakêtek cixaran ji xwe ra kirî. Heta nivê şevê li bajêr gerî. Emîne li Îsa suva hat, pê ra deng ne kir. Çûyîna wî ya bajêr pê nexweş hat. Hespê xwe yê Hesên tim û tim qamçî dîkir. Lawik şaş ma bû; Emîne ji Hesên pir hez dîkir, çima nuha zulmê li wî dike. Sibê zû rabû, hespên xwe av dan, hespê Emînê jî bi xwe ra bir. Li kirarê (danê) nivro Emîne hat. Di destê wê da dîrganek hebû. Îsa jê tiştek fam ne kir, go:

– Ev çi ye? Emîne ber bi Hesên va çû, ew bîhn kir, paşê dîrgan sê caran di zikê wî rakir. Hesên pê ra gêr bû û di bin xwînê da ma. Îsa dîn bû, çavên wî gir bûn, got:

– Çima dîne, çima! Emînê got:

– Tu ji xwe ra dua bike ku min di zikê te ra ne kir, kûçikê pîs î topal. Heta wê rojê, Emînê bi wî ra tu şorên weng ne kiri bûn. Îsa, xwîna wî miçîqî bû û nizanî bû bê

Emîne ji wî çî dixwaze. Kuştina Hesên hişareta tiştekî bû. Îsa çawa li mal vegeerî, axê ew li ber derî girt û gotê:

– De bêje, kûçikê gawir î pîs, Hesên çima mir? Lêwîk got, ez nizanîm, ji Emînê bipirse. Axê lê vegeand:

– Emîne nexweş e.

Ji vê pê ra, qîmetê xwe bizane, ji bona ku tu tim li ber deriyê xelkê neşuxilî, divê tu li gundê xwe vegeerî. Îsa hingê serwest bû ku tu carî xiristyan û misilman nikarin tevîhev bimînin. Ji nuv de çû peravê deryayê û li hêvîya hatina keştiyekê ma.

Bahtiyar Yildirim
030219
HENEK

Kûçikê mala apê Heco pir no ye. Wexta ew ji çolê tê mal wî bi zincîrê girê didin ma ew tu kesî ji malbat û cîranan gez neke (ne dire).Rojekê meta Fatê jî dixwaze here mala apê Heco.Ew jineke sergêjî ye, deriyê mala apê Heco ji hev dike, ew û kûçik têne hember hevandin. Kûçik didanê xwe pê dinimîne. Wê dema ku kûçik dike wê gez ke, meta Fatê deng xwe bilind dike. Heco û malbet jî li wan temaşê dikin. Meta Fat ji kûçik ra dibê di ciyê xwe de rûne, pîs û magdo. Ez temel ji henekê weng hêz nakim.Malbat bi zorê wê ji dest kûçik xelas dikin.

Altun Başaran
030312
ÇIROKA BEQÊ

Çi hebû çî tunebû, beqek hebû. Li dora malan golek hebû. Li ser golê beqekê dilîst. Rojekê şivanek pezê xwe tîne avdanê. Ew pezê xwe av dide. Çavê wî bi beqê dikeve, pê dilîze. Çend rojan wusan dimîne dereng. Jina wî di mereqê da dimîne. Ew rojekê çavnêriya mêrê xwe dike, mêze dike ku ew bi beqê şa dibe. Dora dina rojê ewdi ber mêrê xwe, tê ser golê. Wê bi xwe ra kozeke agir anî bû, davêje beqê çavê wê dişewitîne.Piştî wê, mêrê wê tê, bang beqê dike, dibêje:

– Beqê beqê, beq blûskê, carekê derkeve, çavê te î reşik maç kim.

Beq dibêjê:

– Ne temo ne keto, jina te pîs e qerbeto, tozotkek agir anî, çavê min çijeto.

350;ivan pir diqehere, diçe mal, ji jina xwe ra dibêje

– Te çî xwest ji wî heywanî, hey maka ji kerayê ?

Guldane Bal
030226

BÛKA KU DERGÛŞA XWE DIMIJAND

Ev mesela çel sal berî nuha bûye. Li gundekî kurmancan xortekî çavkusk û fodil hebûye. Em bèn bila navê wî xortî Berdan be. Berdan dil ketiye keçikeke ji gundê xwe. Li ser vê keçikê kilam digotin, dilê Berdan pir şîn bûye. Bavê keçikê, keçika xwe ne daye Berdan, keça xwe daye xortekî din î ji gund. Ev mesela li Berdan pir qeher hatî. Berdan jî dihere ji gundekî din keçekê ji xwe ra tîne. Ev bûka jî pir fodil bûye; bejna bûkê pir dirêj û çavê wê jî kusk bûye. Bukê mîna qeregun ji mêrê xwe tim kut dixwarin. Salek û du sal derbas dibe, keçikeke xwe dibe. Rojekê bûk dergûşa xwe dimijîne, Berdan ji veldo tê bi pêhna xwe li nobarê qunca bûkê dixê û dergûş ji destê bûkê axirde dikeve. Bûka min e qeregun ji yad û girî bêtir tiştêkî nake. Vê bûkê heta ku mêrê xwe mir kut dixwarin.

Esmâ Karakaya 1

030219

TÎRS

Rojekê Nazdarê nameyek ji xwe re dinivîsand. Dema murekeba qelemê teva bû, şêne kir binivîse. Nazdarê ji qelemê ra got:

– Binivîse, hîn nama min teva ne bûye. Tu çima nanivîse Qelemê lê vegerand:

– Bibexşîne, lê murekeba min teva bûye. Ez nikarim binivîsim, heta tu min bi murekebê tijî nekî (danegirî). Nazdarê got:

– Wî murekeba min ne ma. Perên min jî tune ne û hevalên min jî bi deyn nadin min. Eger te nenivîsî ez ê ji diya xwe ra bêjim, ma/bila li te xîne û dawî te bişewitîne. Qelem tirsî û ji Nazdarê pirsî:

– Karê diya te çi ye ?

Nazdarê bersiv da:

– Diya min li nexweşxanê hemşîre ye. Hingê qelemê bêhna xwe berda û heta dev tijî bû û kenî.

Nazdarê:

– Va kena çi ye, tu bi min çima dikenî ? Ez ê ji bavê xwe ra bêjim û ew ê bi kopal li te xîne. Zû were û binivîse. Qelem dîsan tirsî, ji Nazdarê pirsî:

– Bavê te çi karî dike?

Nazdarê got:

–Bavê min qesab e. Tu li ser wê masa bixwîn, baltayê wî dibînî? Wê wextê qelem pir tirsî. Çavên wê şil bûn, dest bi nivîsandinê kir. Lê vê carê dor hati bû Nazdarê, ne murekeb lê Nazdar dikenî.

Esmâ Karakaya 2

030319

DESTPÊKIRINA DIBISTANÊ

Sala 1969a li Gunde Omê min dest bi dibistanê kir. Roja siftê sibê zû rabûm. Lê tirs di dilê min da bû. Bi şev xeva min ne hati bû. Min kincê xwe li xwe kirin û xwe da rû dibistanê. Li baxçê dibistanê em kirin rêzê. Kurkê mezin merşa istîqlalê dixwandin. Min ji lêvên xwe dibir û dihani. Piştî vê em çûn hindurê dibistanê li sinifên xwe belav bûn. Mamostê me dest bi dersê kir. Lê ez di tişteki ne digihîştim. Dot-mama min li teniştê min rûdinişt. Min jê pirsî bê ka ev meriva dibê çi. Wê got, ew alfabê dixwine. Di wê navberê de mamoste tiliya xwe ber bi min va dirêj kir, got:- Ev çi ye ?

Ez tirsîyam, min nizani ez çi bikim. Min deng ne kir. Lê bi rasti ji min nizani bû bê ew çi ye. Dema wextê vehêsinê (tenefus) hat, ez ji dibistanê revim. Bavê min ne dizani ku ez ji dibistanê direvim. Wexta wi bihist êdî dereng bû. Li dibistanê saleke min wusan bi avê da çû ji bona ku ez zimanê turki bihêwisim.

Esma Karakaya 3

BI ZIMANÊ XWE XWENDIN Û NIVISANDIN 3

Ev yeka min di xewna şevan da ji ne didit. Ez spas dikim ji wan kesên ku ev imkana dane me. Anuha em dikarin bi zimanê xwe bixwinin û binivisin. Em jinên kurd bi vi awayi li ser kok û reha xwe şin tîn. Kêfa min bi vê pir tê. Êdi ez serbi-lind im. Em jinên kurd êdi ji ber xwe fedi nakin; dikarin zimanê xwe bi kar binin. Ez dixwazim her kurdek bi zimanê xwe bipeyive.

Necla 1

030219

GÎHAYÊ NEMIR

(Ji romana Olmez Otu ya Yaşar Kemal)

Bayram reş-reş (kuhr-kuhr) diramiya; "herim, nerim? Ez ji vê dayika xwe çi bikim? Jineke pîr û nexweş e, nikare bi me ra were ... "Gundî gî hejar bûn. Xelkê gundê Bayram gî cotkar bûn, havînan xelk diçûn Çukurova û pembo ber hev dikirin. Pîrkê xwe li derva dabû ber rê. Bayram xwe da hêla pîrê û rûnişt.

– Daykê, ez ê jina xwe û zarokên xwe heynim û em ê herin Çukurovê, pembo berhev bikin. Pîrkê dengê xwe ne kir, fam kir ku ew ê ji wan bimîne û di vî gundê mezin da, bi tena serê xwe , mehekê derê wan çav ke. Bayram ji jina xwe ra got:

– Kar û barî xwe bike, em ê herin paleya pembo.

Rojekê, berbanga sibê, xelkê gund li qemyonan bar bûn, çûn. Di gundê mezin da ji pîrkê bêtir tu mirov ne man. Jina Bayram ji pîrkê ra hinek penîr û nan cî hiştî bû da ku ew debara xwe pê bike, heta ew vegezin. Roj derbas dibûn, Bayram bi jina xwe mîna dînan kar dikirin, dixwestin rojekê pêş da vegezin gundê xwe. Pîrka wan bi tenê bû. Li gund kesekî ku pîrê pê ra deng ke tune bû. Diçû der. Tevî mirîşkan dîkek hebû, dîkekî mezin û rengesor. Pîrkê di dilê xwe da derbas dikir, digot ; " ez ê şê bikim vî dîkî ser jê kim, heta Bayram ew hatin ez ê bixwim. Endîn naxwazim penîr û nan bixwim."Pîrê bi şev û roj difikirî; "Ez ê çawa vî dîkî bi dest xim" Dîk li ku pîrê didî jê direvî, wekî ku ji dîk ayan bû be, pîrê wê wî bigre û ser jê ke. Rojekê, pîrê destekî xwe genim kirê, destê xwe yê din jî kevirêkî mezin. Giran giran nêzîkî dîk bû, genimê di destê xwe de havêt ber dîk, dîk serê xwe danî, genim nukul kir. Pîrkê ji nişka va kevirê mezin yê di dest da, li serê dîk xist, dîk li dor hev çerx bû û gêr bû. Pîrkê ew serjê kir, pertiland û keland. Her rojekê hinek goşt dixwar. Deriyê xaniyê pîrikê tim ji hev bû, dipa; li hêviya Bayramê xwe bû.

Çend roj bi şûn da pîrkê şê ne dikir rabe ser xwe, çavê wê li derî bû. Xewn didîtin, Bayramê wê dihat. Bayram bi jina xwe pir pembo jendin hewparê xwe heynandin û ji ber giştikan vegezin gundê xwe. Nêzîkî gund bûn. Bayram meşî heta mala xwe, deriyê xaniyê wî ji hev bû. Kete hundir endîn wext pir dereng bû.

Necla 2

030205

8Ê ADARÊ, ROJA JINÊN CÎHANÊ

Ez dixwazim bi munasebeta 8ê adarê, roja jinên cîhanê, serbûriya jineke kurd ji we ra qal kim. Wexta ew jina ha 14 salî bû, deya xwe nexweş e û dimre. Ew bi xwe zarok e lê dîsan jî li xweng û birangên xwe mêze dikir, karê malê dike. Ew li gund bû û karê xwe pir bû. Ew bi dergistî bû, bûka xalê xwe bû. Evîndaran salekê bi şûnda daweta xwe li darxistin û zewicîn. Dergistiyê wê cotkar bû, havînan ji zeviyan sap dikişandin. Carekê li arebe sap pir helda bûn û dergistiyê wê hilkişiya bû ser arebê. Bextê reş, ji arebê gêr dibe û stûyê xwe dişkîne. Wî bi dest ra dibin bajêr lê bajar pir dûr e, ancax rojekê bi şûnda digihêne nexweşxana bajêr. Tîyê wê dergistiyê wê li nexweşxanê bi cih dike û vedigere otêla xwe. Dotira rojê tîyê wê tê nexweşxanê, çî bibîne, hêstirên çavan xwe berda bûn ser hinarikên rû; weng mit û mat serê xwe danî bû û miri bû.

Wî zemanî adet hebûn. Ew jina neçar diviya bû di wê malê da bi-maya.

Dergistiyê wê mir lê tîyê wê hebû. Mezinê malbatê biryar dan ku ew jina neçar bi tîyê xwe ra bizewice. Ji bona wê tiştêkî pir dijwar bû lê adet wusan bû. Ew bêçare ma bû li ber fermana adetan. Ew zewicîn, ji wan 8 zarok çêbûn, jê yek ez im; ew jina ha dayika min e û yê mirî jî apê min e. Ez bawer dikim ku jin ji mêran hîn xurttir in.

KURDÊN ANATOLIYA NAVÎN LÎ KOKA XWE DIGERIN

Îsal hemû meha Gulanê min li Enqereyê derbas kir. Gelek rojên min bi kurdên Anatoliya Navîn û bi van dorberan ve derbas bûn. Min bi çend kesên re hevpeyvîn amade kirin û ziyaretên cihê cihê pêk anîn. Me hin rojên xwe li *Qawexaneyê Babilê* derbas kir. Xweyê wê kurdekî Qerecdaxê bû, jina wî tirk bû. Zêdetir jina wî li vê qawexanê mêze dikir. Ev ciha teze hatibû vekirin. Mirovan hêdî hêdî ev deran nas dikirin.

Di roja 3/5.2003 berbi êvarê ez û sê hevalên min yên Qersê çûne Quliyê

bûne mêvanê Dr. Mehmet. Lê belê em zêde li navça bajêr neman, me berê xwe da gundê Qerecdaxê. Du malên Mehmet hene, yek li navça bajêr e, yek jî li gundê wan Qerecdaxê ye. Mala wan ya gund zêdetir hewadar û bêdeng bû. Zarokên wî Şîrîn, Leyla, Hêlîn, Rengîn û xanima wî Rehm jî li gund bûn. Em neçûne hundir, em li derva runiştin. Me li wir jî şîva xwe xwar. Piştî çend seetan ew hersê hevalên min bi texsiya xwe careke din vegehiyan Enqereyê, ez wê şevê li Quliyê mam.



Ji çepê: Galip, bavê Galip Hecî Mele, Dr. Mehmed, Duman Polat

Di roja 4/6. 2003an bi heval Galip û Mehmet re em çûne çend gundên Balayê. Heval Galip ev gundan baş nas dikir, çimkî ew bi xwe jî li van deveran mezin bûye. Piştî gereke dûr û dirêj em gihiştin gundê Galip. Berî ku em bên vî gundê bi navê Gundê Bîrê em ji nav gelek gundên mayin re derbas bûn. Wek gundên Hecîyar, Rastika, Camliya Mezin, Camliya Piçûk, Kulika, Kesik...Gelek kesên ji gundê Bîrê li Ankarê dimînin, bi karên sîgortayê, qesabiyê, qawe, çayxanê re mijûl dibin. Ew ji eşîra Heciban re girêdayî ne. Navê bavê Galip, Hecî Mele ye. Bavê Galip kesekî ser bi xwe bû, bîna mezinan, axa û began jê dihat. Kesekî kibar bû. Me bi hevra resim kişand, daxwaza me şunda venegerand. Malbata wan wek Mala Têco tên nasîn. Bavê Galip koka mezinên xwe heta Rihayê dirêj dike. Angorî wî, ew ji Rihayê hatine Balayê. Bavê wî Mele Şêxo, kalkê wî Şêxoyê Beko, kalkê kalkê wî Bekoyê Teco hemû li derdorê Balayê hatine dinê. Lê belê dewama secerê wek Tecoyê Şêxo, Şêxoyê Hemê û Hemê Lorê li Rihayê ji diya xwe bûne. Berî ku zagona paşnavan li Tirkiyê derkeve, navê vê malbatê Şêxoxullari bûye. Bavê Heciyê Mele, ango Meleyê Şêxo qasî 25 salan li gundê xwe mixtarî kiriye. Wusan tê xuyan, ev mala, maleke şêxan, heciyan û melan bûye. Malbatek dîndar bûye. Piştî de-



Li gundê Seyît Alp,
ji milê çepê, yê sêyemîm birayê Seyît Alp e

mekê me xatirê xwe ji wan xwast. Paşê em çûne derdorê, Baraja Irfanliyê, Kesikkopriyê, me li wir nan xwar. Vê carê hevaleyê me zêde bû. Navê wî Duman Polat bû. Ew nasê heval Galip bû, ji gundê wan bû. Heval Duman Polat hevaleyê sohbetxwaş bû, zarê wî gelek şirîn bû. Wê rojê serî wî zêdetir mij û duman bû. Ew loqîntaya ku me li wir zikê xwe têr kir li berpala gola barajê hatiye çêkirin. Wek cîhekî turîstîk bû. Vegerê me riya gundekî Şereflikoçhisarê xist. Navê gund Karlikişla bû. Em çûne mala birayê Seyît Alp. Çawa tê zanîn Seyît Alp nivîskarekî navdar yê vê deverê bû, berî çend salan çûbû rehmetê. Em bûne mêvanê birayê wî.

Piştî vê gerê min berê xwe dîsa da Enqereyê. Min li Enqereyê çend kesên mayin yên ku ji Anatoliya Navîn hati-



Ji çepê: Bahattîn Çalış, Halil İbrahim Uçak

ne, dîtin. Wek Halil İbrahim Uçak, Ayşe Yildirim, İsmail Susli, Ruken Alp, Bahattîn Çalış...

Halil İbrahim Uçak ji Haymanayê ye, lê belê gelek salan li Polatliyê maye. Paşê mala xwe bar kiriye, aniyê navça Enqereyê. Niha li bal Parlementerê Agiriyê Naçî Arslan wek şewirman kar dike. Kesê ku Halil İbrahim Uçak li Enqereyê nas neke, tune ye. Kesekî vekirî, sosyal û sohbetxwaş e. Gelek rojên me bi hevra derbas bûn. Halil İbrahim Uçak di sala 1954an de li gundê Emirler Kesikkavak (Şêxanê Berbayê) hatiye dinê. Ev gunda bi Haymanayê ve girêdayî ye. Navê eşîra wî Şêxanli ye. Angorî gotinên gotiya eşîra wî di sala 1780î de ji qezaya Rihayê ya bi navê Siruçê hatiye. Eşîr sê milên wê hebûne. Milek hatiye gundê wan, milek Emîrlar Eskiçalış, milê din jî hatiye gundê Konakgormez Kebîr cî-

war bûye. Dema ji Rihayê hatine riya xwe li gundê Balçikhîsarê (qeza Mahmûdiyê, Eskişehir) xistine, çend salan li wir mane. Îro gelek gundiyan wan çûne Almanyê, Danmarkê, Norweçê, mirov dikare bêje %50 kesên wî gundî derketine dervayî welat. Gelekan jî bar kirine, çûne taxên cihê yên Polatliyê cîwar bûne, wek Zafer, Gulveren, Esentepe, Cumhuriyet, Kurtuluş û Gazî. Kesên ku derketine Ewrûpayê piraniya hatin û qezencên xwe li Polatliyê radizînin. Di sala 1959an de mala wan bar kiriye, çûye Polatliyê. Bavê wî bakalî dikir. Wî xwandina xwe ya pêşîn, navîn û lîseyê li Polatliyê qedandiyê. Paşê di rojnameya bi navê *Postaya Polatliyê* kar kiriye û bûye midirê berpîrsê nivîsan yê vê rojnameyê (1974-1974). Di sazkirina komela bi navê *Huner 74*an de beşdar bûye. Temsîlkarê Polatliyê yên rojnemeyên

wek *Vatan* û *Aydinlikê* kiriye. Demekê di Belediya Polatliyê de bi karên çandî ve mijûl bûye. Du sala midirê karên nivîsê yê *Kovara Demîryolu* ku ji sala 1925an virda derdikeve, kiriye. Wusan jî di kovara *Demed* ya Komela Memurên Demiryolê xebitiye. Di gelek cihên mayin jî kar kiriye. Di sala 1985an de derbarê Haymanayê pirtûkek weşandiye. Di nav rûpelên pirtûkê de zaniyari û agahdariyên ku Haymanayê didin nasîn cîhekî fireh digrin. Vê xebata Halîl Îbrahîm Uçak nêzîkî du salan ajotiye. Wî ji bo nasandina Haymanayê belgeselek jî amade kiriye. Di sala 1995an di amadekirina *Rapora Pirsê Rohilatê* cîh girt. Ev rapora bi pêşengiya Dogu Ergil de hatibû nivîsîn. Ji bo amadekirina vê raporê, Halîl Îbrahîm Uçak bi grupek xebatkar ve çûne hin deverên Kurdistanê, di cîh de lêkolîn çêkirine û anket pêkanîne.

Halîl Îbrahîm Uçak di sala 1997an de dest bi amadekirina lêkolîneke derbarê mala Cemîl Paşa kir. Bi endamên malbatê ve hevpeyvîn çêkir. Gelek malzeme û çavkaniyên ku heta niha tu li cîhekî nehatine weşandin, bi dest xistiye. Şecereke ku ji 47 rûpelan pêkhatî amade kiriye. Ev şecera heta salên 1400 dirêj dibe. Ev xebata wî wek pirtûk di nav demeke kin de wê bê weşandin. Niha derbarê Şêxbiziniyan de xebatekê amade dike. Bi taybetî şopa dîrokî ya kurdên ku koçberî Bala, Polatli, Şereflikoçhîsarê kirine, digerin. Ev babeta ji bo wî bûye babeteke balkêş e. Xebateke wî ya mayin derbarê *Pêxasên (Qabadayi) Kurdan* e. Bi kurtî Halîl Îbrahîm Uçak di gelek karan de xebitiye û çend proje danîne pêşiya xwe.

Dema em bi hevra bûn, em çûne çend cihên mayin, wek *Komela Alik-*



Ji çepê: Ayşe Yildirim, Şevket Kaxitçi, İsmail Suslı

riyê û Hevnasînya Haymanaliyan. Navça vê komeleyê li Enqereyê ye. Qasî 500 endamên wê hene. Kurê Ahmet Turgut, Ozdemir Turgut demeke dirêj alikariya komelê kiriye. Komele heta niha jî li ser piya maye. Derbarê xebatên komelê de em bi sekreterê wê Mehmet Oztaş re peyivîn. Kesekî bêreng bû, qet ji cîhê xwe ranedibû, haya wî zêde ji kokên wî tune bû an jî dixwast wusan xwe bi me bide nasîn. Mirov nizanibû ew kurd e an tirk e. Bi Festîvala xwe ya birinc ve mijûl bû. Ev şahiya hersal li derdorê Haymanayê di hate pîroz kirin.

Paşê min Ayşe Yildirim nas kir. Ayşe Yildirim li navça Enqereyê dimîne. Ew ji gundê Burunsuzê ye (gundekî qezaya Haymanayê). Ayşeyê Beşa Folklorê, li Unîversîta Enqereyê xwandîye, niha di Unîversîta Hacetepeyê, di beşa Antropolojiyê de derbarê eşîrên kurdên Anatoliya Navîn de teza xwe ya lîsansa bilind amade dike. Bi taybetî eşîrên Reşwan û Şêxbiziniyan hemberî hev dike, dixwaze sedemên cudatiyê di navbera wan de derxe holê. Piştî çend mehan ew ê vî karê xwe biqedîne. Belkî ev cara pêşîn ku kurdek derbarê eşîr û jîyana kurdên Anatoliya Navîn de xebateke akademîk amade dike. Piştî qedandina karên xwe Ayşe wusan tê xuyan wê bibe pispore, lêkolîner û nivîskareke Kurdên Anatoliya Navîn. Çend makaleyên Ayşeyê di kovarên cîhê de hatine weşandin.

Ayşe Yildirimê ez ji xebata hevaleyê xwe agahdar kirim. Navê wî Abdurahman Karataş e. Wî li ser babeteke balkêş tezek amade kiriye. Babeta vê xebatê koçberiya kurdan ya berbi

Anatoliyê ye. Gundekî bi navê Neşretiyê ji xwe hîlbijartiyê. Ev gunda bi devera Ortaklar, Ortaklar bi qezaya Germencik, Germencik jî bi bajarê Aydinê ve girêdayî ye. Gelek kurdên Muşê, Vanê, Agiriyê û Diyarbekirê koçberî vî gundî kirine. Paşê gund mezin bûye û di dawiyê de bûye du beşan. Lêkolîner minasebet û pevgirêdanên di navbera van herdu civatan di xebata xwe de lêdîkolîne. Di vî gundî de guhartinên duh û îro bûye babeta vê xebata Abdurahman Karataş. Keçevala wî Nîlufere jî beşa Folklorê qedandiye. Tenê wê na, bavê wê, diya wê jî ev beşa berî salan xwandine. Mirov dikare bêje ku Malbata Nîlufere bûye *malbateke folklorîk...* Ayşe Yildirim, Nîlufere û Abdurahman Karataş hin caran bi hevra kar kirine û li Anatoliya Navîn gerên xebatê pêk anîne. Min hevaltiya wan gelek bi dostane û germ dît.

Li Enqereyê vê carê min malbateke mayin ya kurdên Anatoliya Navîn jî nas kir, malbata nivîskar Seyit Alp. Berê min bihistibû ku malbata wî li li Enqereyê dimîne. Kurdekî ji devera Agiriyê, ew bi xwe jî nivîskar e, Baran Aydın gote min ku keça Seyit Alp, Rûken Alp, di dersxana wan de wê dest bi mamostetiya felsefeyê bike. Rojekê şunda ez, Baran, Rûken û çend hevalên mayin li çayxanekê de civiyan, me ji xwe re sohbet kir. Baran Aydın hevaleyê Seyit Alp yê kevn bûye, wî dengê Seyit Alp hildaye ser bandê, pê re hevpeyvîneke dirêj amade kiriye. Rojekê jî rojan dixwaze biweşîne. Seyit Alp çawa tê zanîn berî çend salan vefat kiribû. Jina wî bi kurê xwe Rohat Alp ve tevayî dimîne, Rûken û mîrê wê li taxeke mayin ya

bajêr dijîn. Rojekê em bûne mêvanê mala Seyit Alp. Me dûr û dirêj behsa Kurdên Anatoliya Navîn û rewşa vê deverê kir. Wusan jî derbarê jiyân û berhemên Seyit Alp de em peyivîn. Di dawiyê de xanima wî destnivîsên du romanên Seyit Alp ku heta niha tu cîhekî nehatine weşandin teslimê min kir ku ew li Ewrûpayê bên weşandin. Min bi kêfxwaşî ev yeke hilda ser milê xwe. Ji bo amadekirina çapê, ev berheman min paşê anî Stockholmê teslimî berpîrsê APECê kir. Ez bawer dikim ev herdu berhemên di nav demeke kurt de wê bên weşandin. Kurê Seyit Alp, Rohat Alp vê gavê di Unîversîta Hacetepê de beşa dîrokê dixwîne. Hêvî dike ku piştî qedandina zanîngê rojek ji rojan dest pê bike ku dîroka Kurdên Anatoliya Navîn lêbikole. Keça Seyit Alp, Rûken Alp mamostetiya felsefeyê dike. Wê biryar girtiye ku bi deh jinên Kurdên Anatoliya Navîn (jinên pîr, salbihurî) ve deh hevpeyvînan çêbike, wan wek pirtûkeke hevpeyvînan biweşîne. Eger rojekê ev proja Rûken Alp ya dîroka devkî bi serkeve ez bawer dikim wê bala gelek lêkolînan û xwendevanan bikêşîne. Çend nivîs û helbestên wê di kovarên felsefê û huner de hatine weşandin. Ew hewl didê ku zêdetir wext ji bo nivîsê peyda bike.

Li nav Enqereyê gelek cihên kurdên Anatoliya Navîn hene, yek ji wan jî çayxana Îsmail Susli ye. Di zikê Enqereyê de vekiriye. Îsmail Susli di sala 1969an de li gundê Sindiran (Yenice) hatiye dinê. Di sala 1996an de Fakolta Siyasatê li Enqereyê qedandiye, lê belê memurtiya dewletê nake. Wî di zikê

Enqereyê de ev çayxana piçûk vekiriye, vê gavê li ser karên xwe ye. Ibrahim Susli kesekî zane, sosyal, hurmetkar û welatparêz e. Li çayxana wî gelek hemşeriyên wî berev dibin. Kesên xwandî û nexandî li vir rastî hev tînin, kesên ji Anatoliyê û ne ji Anatoliyê dîsa li vir hev dibînin. Jin û mîr, keç û xort herkes dikare li vir bîna xwe derxe, rûnê û wextê xwe derbas bike. Kesekî/e bixwaze kurdên Haymanayê ji nêzik ve bas bike divê sedî sed rîya xwe li vê çayxaneyê bixe. Eger wusan neke, nabe. Ez û Ismail Susli di roja 31/5.2002an çûne wê pirtûkxaneyê bi navê Akademia. Me bi hevra derbarê kurdên Haymanayê dûr û dirêj deng kir. Bi taybetî wî derbarê koka Şêxbizîniyan de qala gelek dîtînan û tezan dikir. Angorî dîtinekê ev kesan bi pêşengiya Şêxê Bazîyan hatine Haymanayê. Dîtîneke din jî dibêje ku di destê wî da bazînan hebûne. Peyvên *Bazîyan* û *bazînan* angorî van dîtînan koka peyva Şêxbizîniyan pêk aniye. Ev dîtînen etîmolojîk yê populer vê gavê di nav Kurdên Anatoliya Navîn de gelek tînin efirandin û gotin. Gundê Sindirîn gundekî mezin e, qasî 10 hezar nifûsê vî gundî heye. Ji wan gelek bar kirine navça Enqereyê, di dawiya heftê tînin gund, di nav hefte de li Enqereyê dimînin. Îsmail Susli van kesan bi "karkerên hefteyî" nav dike. Angorî Îsmail Susli di salên 1930-1950î de pêlên koçberiyê yê duwemîn berbi Enqereyê dest pê kirine, wek koçberî berbi Baybatê (Sînop), Gevya (Adapazarê), Merzîfon (Amasya), Bafra (Samsun) Ew Şêxbizîniyên ku bar kirine çûne Bayburt, Erzîrim û Agiriyê kirmancî



Jina Seyît Alp, bi kurê xwe Rohat Alp û bi keça xwe Rûken Alp ve

deng dikin. Ji wan re 'celî' tê gotin.

Ji der Halîl Îbrahîm Uçak, Ayşe Yildirim, İsmâîl Suslî, Ruken Alp, min di çayxana İsmâîl Suslî de nasiya xwe da Bahattîn Çaliş. Mirovekî salbihurî bû. Guhên wî giran bibûn. Gotinên kesên dorberê xwe dereng dibihîst. Berî çend salan pirtûkeke bi navê *Ji Duh heta Îro Haymana û Germavkên Wê* dabû weşandinê. Bahattîn Çaliş û Halîl Îbrahîm Uçak wek du pisporek bajarê Haymanayê tên nasîn. Ev bajara wek paytextê devera Kurdên Anatoliya Navîn tê hesibîn û zanîn.

Bi kurtî çawa me li jor jî bi çend mînakên ve dîyar kir, di nav nivîskar, lêkolîner û xwendekaran de hewas û daxwazeke mezin ya lêkolînê û xwandinê heye. Mirov pey koka xwe ketine, şopa xwe digerin. Ez bawer dikim jî vê tevgera xwevegerê gelek tişt û cevherên nû wê derkevin holê. Ji niha ve derbara Kurdên Haymanayê, derbara Şêxbiziniyan û bi taybetî jî derbara gundê Sindirîn (Yênice) de meraq û

hewaseke mezin heye. Angorî îfadeyên İsmâîl Suslî vê gavê kesekî bi navê Hamdî Çeker li ser gundê Sindirîn monografîke fireh amade kiriye û benda weşandinê ye.

Min çend rojên xwe bi Mehmûd Yucelî re derbas kir. Mahmûd Yucelî jî Amadê (Diyarbakirê) ye. Jina wî jî Kurdên Anatoliya Navîn, ji Gordoxliyê (Zincirlikuyu) ye. Mala wî li taxa Keçîorenê bû. Mirov dikare bêje Keçîoren tijî Kurdên Gordoxliyê bûye. Em ji nav sûka taxê re derbas bûn, çûne mala Mehmûd. Mehşer bû. Mirov nikaribû gava xwe bavîta. Me bi hevra kurdî deng dikir. Vê yekê bala du jinan kişand, zanibûn em kurd in, ji bin lêvan ve dikeniyen...Paşê me ji wan pirsî ka bizanibin ku ew ji kîderê ne? Mirov bersîva wan dikaribû texmîn bikira, wek texmîna me jî derket: *Gordoxlî*...Ew di salên 1960yî de hatine Enqereyê, li wir cîwar bûne. Mala Mehmûd tijî pirtûk in, li herderê malê pirtûk hene. Balkona xwe jî tijî pirtûk

kiriye. Ew kesekî pirtûkhez e. Hemû pirtûkfiroşên Enqereyê yên ku pirtûkên kevn û nadîr difroşin, ew Mehmûd nas dikin. Ew gurê pirtûkan e. Mehmûd zef dixwîne, angorî jina wî wusan dixwîne ku êdî ji nivîsê re wext namîne. Jina wî dixwaze ku Mehmûd teza xwe ya lîsansa bilind (master) zûtirekê binivîse û biqedîne. Ew bawer dike ku êdî ew dikare wê demê ji derdê pirtûkan xelas bibe. Lê belê Mehmûd kesekî wusan ecelok, lezobezo nîne, dixwaze her tişt bi hemdî xwe bimeşe, stresê hez nake. Di vê malê de wext angorî her endamekî/e malê tiştêkî gelek cihê ye. Di vê malê de çima Tirkî tê deng kirin? Bersîv ji hev cihê dibin. Angorî jina wî, kurdiya Anatoliya Navîn ne wek kurdiya Diyarbekirê ye. Ev bersîva mirovan zêde têr nake. Dema mirov ji Mehmûd dipirse, ew dibêje ku "Ez jî qet nizanim em çima Tirkî deng dikin". Ji Kurdên Gordoxliyê hinek asîmîle bûne, hinekan ji xwe re kirine edet di malên xwe de Tirkî dipeyvin. Ev problema ne tenê problema malbata Mehmûd e, problema hemû malbatên ku koçberî bajarên mezin kirine dikare bê hesibîn. Lê belê çî dibe li zarokan dibe. Li jêr serpêhatiya Dîlanê her tiştî baş radixe ortê...

Ez êvareke bûme mêvanê Mehmûd. Du zarokên malbatê hebûn. Navê keça wî ya piçûk Dîlan, keçeke 6-7 salî bû. Zarokeke gelek şîrîn bû. Min mêze kir bi wê bejna xwe ya kurt li ser qoltixeke mezin rûniştibû, zûr bibû li me dinêrî. Dîlan Tirkî dipeyivî, kurdî nizanibû. Dema ez çûme mala wan, min bi kurdî bi endamên malbatê re deng kir. Lê belê Dîlan, bi hatina min ewqas kêfx-

waş nebû. Çimkî min kurdî deng dikir. Revena Dîlanê ji gotinê min qet tiştêk fam nedikir. Ji bavê xwe re digot: "Bavo ev mirova zef deng dike" (Baba bu adam çok konuşuyor!). Ji ber ku gotinên min fam nedikir, angorî Dîlanê min zef! deng dikir. Paşê jî bavê xwe pirsî: "Bavo te ev mirova ji ku anî?" Mehmûd bi zimanekî xwaşik jê re îzah kir: "Ew îşev mêvanê me ye, sibê wê here mala xwe". Ez wê şevê li wir mam. Rojtira din dema serê sibê, min mêze kir ku dengê Dîlanê tê, pey şopa min ketibû û jî bavê xwe dipirsî: "Bavo ew mirovê zimanê Kurdî çû kîderê (Baba o Kürtçe adam! nereye gitti). Navê min êdî derketibû "Kürtçe Adam"...Bavê wê wek hertim bi zarekî nerm bersîva wê da: "Keça min dengê xwe neke, ew razaye!". Ev jî baş bû, Dîlanê kurdî nizanibû, lê belê êdî qet nebe wê zanibû ku zimanekî bi navê Kurdî heye. Dîlan her diçû şîrîntir dibû.

Ez bawer dikim ku ev serpêhatiya Dîlanê ya rênîşandar û hînker çend aliyên zimîn yên sosyolojîk û psîkolojîk gelek bi eşkere radixe ortê. Divê kesek rabe babeta koçberiya gundê Gordoxlî li Keçîorenê bike babeta lêkolînekê. Bi rastî jî gelek aliyên ve babeteke balkêş e. Ne tenê pirsî ziman, gelek babetên mayîn jî divê bîrîn lêkolandin. Ji ber ku di jiyana van malbatên kurd yên metropolê de guhartinên gelek mezin diqewimin.



Bi minasebeta bîranîna
sedsalîya Cîgerxwîn
hevpeyvînek bi Hanefî Celeplî re



Cîgerxwîn li Stockholmê

Birêz Hanefî Celeplî, îsal sedsaliya Cîgerxwîn temam dibe, te wek kurdekî Anatoliya navîn Cîgerxwîn ji nêz ve naskiriye, tu dikarî ji bo xwendevanên me seydayê Cîgerxwîn bidî nasîn?

– Navê Cîgerxwîn yê eslî Şêxmûs e. Di sala 1903-an de ew, li gundekî Nisebînê, Hesarê hatiye dinê. Bavê wî Hesen û diya wî Eyşan e. Malbateke gundî û feqîr e. Berî Şerê Cîhanê yê I-em, malbata Şêxmûs ji Hasarê bar dikin û li bajarê Amûdê – li başûrê rojavayê Kurdistanê- cîwar dibin. Piştî demekê bavê Şêxmûs diçe rehma xwedê. Salekê şunda Şêxmûs diya xwe jî winda dike. Şêxmûsê sêwî geh li cem birayê xwe yê mezin, Xelîl geh li cem xwûşka xwe Asiye dimîne. Ji yanzdeh xwûşk û bira tenê ew hersê mane, yên din ji ber şertên dijwar mirine.

Şêxmûs, li cem jineke kurd, Xoce, dest bi xwendina xwe ya pêşin dike. Navê Xoce yê eslî Zeyneb e, keça şêxekî ye, dema bavê wê dimire, dewsa bavê xwe dersên olî dide.

Şêxmûsê sêwî nema dikare xwendina xwe bidomîne û ew li cem xwûşk birayê xwe demekê karê rênçberiyê û şivaniyê dike. Lê ew ji vê jiyânê qet ne raziye. Biryara xwe dide û dest bi xwendina medresê dike û dibe feqî. Li gor edetên wê demê feqîyan medrese diguharandin û li deverên cîhe xwendina xwe dikirin. Bi vî rengî Şêxmûs, li gelek deverên Kurdistanê digere, rewşa gelê xwe baş nas dike.

Şêxmûs, di xwendina xwe de gelekî jêhati ye, di demeke kin de xwendina xwe temam dike û îcaza (dîploma) xwe digre. Ew êdî Seyda ye. Ji bo ku karibe



Prîskê Mihoyî, Cîgerxwîn, Hanefî Celeplî

abûra xwe bike, ew dest bi meletiyê dike. Lê ew reng jîyan jî ne bi dilê Seyda ye. Seyda vedigere û du gundan ava dike, navê yekî Cehennem, yê din jî Çêlek datîne. Ev kar jî naçe serî. Piştî demekê gundî şerê hev dîkin. Seyda jî vî karî jî destê xwe dikişîne.

Dema Şêxmûs li medresan dixwîne, seranserê Kurdistanê di bin agir û şewatê de ye. Şerê Cîhanê yê I-em bi dawî bûye. Serhildanên li bakûrê Kurdistanê şikestine. Rêberên şoreşê xwe gihandina binê xetê. Wê demê nasiya Seyda Şêxmûs bi gelek rêberên ku hatine binê xetê re, çê dibe. Ew tesîrekê mezin li ser Seyda Şêxmûs çêdikin. Ji xwe Seyda Şêxmûs di feqetiya xwe de li gelek deverên Kurdistanê geriyaye, rewşa ku gelê kurd têde ye baş naskiriyê. Her zordestî û belengazi ye. Sedema vî yekî ne tenê dijminê dagîrker e, herweha şêx û axa jî xwedîpar in di vî warî de. Lewra Seyda Şêxmûs cibe û

şaş datîne alikî û dest bi xebata welatperwerî dike. Êdî navê wî jî Cîgerxwîn e, ji derdê millet cîgera wî bûye xwîn.

Cîgerxwîn êrîşên xurt dibe ser şêx û axan. Ji xwe re dijminên mezin peyda dike, lê ew natirse, gelê kurd jî li wî xwedî derdikeve.

Li vir ez dixwazim serpêhatiyekê ji xwendevanên Bîrnebûnê re bînim zîman.

Min cinazê Cîgerxwîn bir Kurdistanê û teslîmê gelê kurd kir. Piştî çend rojan ez li gundên li dorhêla Qamişloyê geriyam. Di her civatê de haziran, qala bîranînên xwe yên bi Cîgerxwîn re dikirin. Li gundê Telşêirê, kalekî – navê wî naye bîra min- qala serpêhatiyekê xwe kir. Ewî got: *-Roja îne bû. Di mizgeftê de şêx waiz dida. Şêx şor gerand û anî ser Cîgerxwîn, ku çawa kafir e, çawa bê ol û bawer e. Cimaet şaş mabû û li çavên hev dinihêrîn. Ji nişkava gundîkî gotina şêx birî û got: "Şêx*

efendî, şêx efendî bese, xelq alême Stalînên xwe hene, Hîtlerên xwe hene, bira me jî kafîrekî me hebe, tu çi dix-wazî ji wî camêrî”.

Ev yeka jî nîşan dide ku gelê kurd ji Cîgerxwîn pir hez dikir. Wekî ku mirov xwe di neynîkê de bibîne, wî jî rewşa xwe û welatê xwe di helbestên Cîgerxwîn de didît. Hê helbestên Cîgerxwîn çap nebûbûn ji aliyê dengbêjan de li çar aliyê Kurdistanê bi riya stranên belav dibûn. Di şiyarbûna gelê kurd de, rola helbestên Cîgerxwîn xwedî cîhekî teybetî ne.

Cîgerxwîn şaîrekî mezinê kurd bû bêgoman. Lê ew ne tenê şaîrê kurdan bû, wî ji bo hemû bindestên cîhanê şer dikir, ew heval û hogîrê azadî- û aşîfî-azan bû. Heta roja ku serê xwe dayne, wî ji bona azadî û aşîfîyê têkoşîn da.

Cîgerxwîn qiymeteke mezin dida azadiya jinan. Wî digot: nîvê netewekê jin in. Eger jin di xebata netewî de beşdar nebin, ew netew nikare bi pêşde here û bighê azadiya xwe, ew netew dê mîna laşekî nivî şelal bimîne.

Cîgerxwîn hertim bang li kurdan dikir wekî zarokên xwe -çi kur, çi keç- bidin xwendin. Wî tim dianî ziman ku dijminê netewa kurd ya herî mezin, nezanîn e.

Hevnasiya û hevkarîya we çawa destpêkir?

- Sala 1979 bû. Ez û du hevalên min, em ji bo du mehan derketibûn gerê, em heta Ermenistanê çûbûn ji bo serdana kurdên Ermenistanê. Gava em vegehiyan -destpêka tebaxê bû- min bihîst ku Cîgerxwîn hatiye Swêdê. Şabûneke mezin di dilê min de çêbû. Derfetek ketibû destê min ku ez Cîgerxwîn nas bikim.

Nav û dengê Cîgerxwîn min li Swê-

dê bihîstibû. Gava ez hatim Swêdê, di sala 1973-an de, kurdiya min a axaftinê û nivîsandinê qet tunebû. Ez hinekî têdigêhiştim, ewqas. Lê ji min re bûbû derd, min dixwest zimanê xwe yê dayîkê ji nûve bipişkivînim. Wê demê nivîsên kurdî kêm bûn. Rêxistînekê kurdan bi navê Bahoz, Dîwana Yekan, ji nûve, teze çapkiribû. Nusxayek ji wê Dîwanê kete destê min. Cara pêşîn bû ku min berhemeke bi zimanê kurdî xistibû destê xwe. Dîwana Yekan her li bin balgîyê min de bû. Çavkaniya kurdiya min, piştî dayika min, ew Dîwana Cîgerxwîn bû. Niha jî bextê min lêxistibû ku ez xwedanê wê dîwanê bibînim û nas bikim.

Gava Cîgerxwîn hate Swêdê, ew li bajarê Uppsalayê bi cîh bûbû. Cara pêşîn min ew li bajarê Stockholmê, di çalakiyê kurdan de dît. Çûme cem û min nasiya xwe daye.

Rojekê zivistanê, di destpêka meha çilê de, ez ketim rê û çûme Uppsalayê, serdana Cîgerxwîn. Beledîya Uppsalayê ew li xaniyê emirmezinan de bi cîh kiribû. Dawiya heftê bû, nayê bîra min, roja şemî an jî yekşem bû. Gava min derî vekir û ketim hundir, çî bibînim, Cîgerxwîn paltoyê xwe li xwe kirîye û di quncîka oda xwe de rûniştîye; serma girtîye û zekemî bûye. Wî got wekî du roj in ew di vî halî de ye. Kurdek jê re kirine berbirsyar ku lê mêzeke, lê du rojin kes diyar nebûye û kalorîfêrên odê jî naxebitin. Min jê re got: *Seyda weha nabe, em diçin mala min û îro pêde hûn mêvanê min in.* Wî jî got: *Tu dizanî yabo.* Ez rabûm, min tiştên Seyda kom kirin, çend pirtûk û cil û bergên wî, xistin du torbeyên



Cîgerxwîn û Hanefî Celeplî li Stockholmê di civîneke aşitiyê de

naylon, em li makîna min siwar bûn û hatin Stockholmê, mala min. Êdî Cîgerxwîn mêvanê min bû.

Piştî çend heftan, nêzî sersala 1980, xanima Cîgerxwîn, xaltiya Kehla û qîza Cîgerxwîn, xwûşka Gulperî jî hatin Swêdê. Heta ji wan re xaniyek derket, nêzî pênc mehan mêvanê min bûn. Di vê navberê de hukumeta Swêdê jî mafê penaberiyê dabû Cîgerxwîn û malbata wî.

Malbata Cîgerxwîn, li gel xwe destnivîsarên wî jî anîbûn Swêdê. Bi dehan destnivîsar ku hê rûyê çapê nedîtibûn. Heta sala 1973-an, ji heyst dîwanên Cîgerxwîn tenê çend heb hatibûn çapkirin; Prîsk û Pêtî – 1945, Sewra Azadî – 1954 û Kîme Ez – 1973. Li gel van dîwanan çend xebatên Cîgerxwîn yên din jî hatibûn çap kirin; li ser zimanê kurdî û çend çîrok.

Gava destnivîsarên Cîgerxwîn hatin û gîhan coxrafyake azad, êdî lazim bû

ku bêne çapkirin û di nav gelê kurd de belav bibin. Li ser daxwaza Cîgerxwîn, ev karê pîroz min da ser milê xwe û pênc dîwanên wî, min li pey hev çap kirin; Ronak – 1980, Zend Avista – 1981, Şefaq – 1982, Hêvî – 1983 û Aşitî – 1985.

Li Swêdê jiyana wî çawa derbas dibû? Kêfa wî, ruhuyeta wî ya li hember Swêd, xeribiyê û kurdên li Swêdê çing bû?

– Herçend Cîgerxwîn bi bedenê xwe ve li Swêdê bû jî, bi mêjûyê xwe ve ew her li Kurdistanê bû. Bûyerên ku li Kurdistanê diqewimî pir ji nêzik ve dişopand. Çi çalakiyên kurdan hebûya, Cîgerxwîn wek mîlîtanekî cîhê xwe te de digirt. Rewşa azad li Swêdê, jê re derfetek bû ku karên xwe yên siyasî û edebî bimeşîne û bi serbestî bigere, biçe welatên din ku kurdan û xebatên wan bibîne.

Ew ji Swêdê û swêdiyan gelekî razî bû. Çapemeniya Swêdê cîh didan dîtin- û xebatên wî. Gelek caran radyo,

têlevîzyon, rojnameyên Swêdê li gel Cîgerxwîn program çêkirin, pê re roportaj kirin.

Cîgerxwîn bûbû endamê Yekîtiya Nivîskarên Swêdê. Yekîtiya Nivîskaran him madî, him jî manewî alîkariya Cîgerxwîn dikir. Konseya Çand ya Swêdê ji bo çapkirina hemû berhemên Cîgerxwîn alîkariya madî da.

Qedre Cîgerxwîn li cem aşîtaxazên Swêdê gelekî bilind bû. Cîgerxwîn her tim dihate vexwandinê civîn û şevên aşîtiyê. Di van civîn û şevan de Cîgerxwîn axaftin dikir û helbestên xwe dixwend.

Rewşa civata Swêdê, xweşikbûna tabîata Swêdê bala Cîgerxwîn pir di-kişand. Carina digot: *-Ew welata pir xweş e, pir xweş e lê Kurdistan xweşiktir e.* Hesreta Kurdistanê di dilê wî de her agir û pêt bû. Kurdên li Swêdê qedre Cîgerxwîn baş digirtin.

Tim dihatin seredana wî û ew vedixvandin malên xwe. Cîgerxwîn jî qet ferq nedixist nav wan an siyasetên kurdî. Bi eynî dûrbûnê nêzîkî hemû siyasetan dibû, her dixwest ku kurd bibin yek, bi hev re kar bikin, yekîtiyan saz bikin.

Piştî ku Cîgerxwîn hate Swêdê we bi hev re hinek seyehat kirin, tu dikarî hinek bîranînên xwe bi me re jî parve bikî?

– Gera Cîgerxwîn li Ewropayê ya pêşin ji bo Elmanyayê bû. Federasyona Komelên Karkarên Kurdistanê, KOMKAR, Cîgerxwîn vexwendibû kongra xwe. Em bi trenê çûn Frankfurtê. Komeke mezin ji endamên Komkarê bi destyên gula em pêşîwazî kirin. Di rojên din de kurd dihatin silava Cîgerxwîn û bi hezkirin guhdariya wî dikirin. Herweha Cîgerxwîn jî gelekî dilşad dibû bi

dîtina kurdan û xebatên wan li dervayî Kurdistanê. Roja ku kongre dest pê kir, saloneke mezin ji delegasyonan û mêvanan tije bûbû. Xortên ku karê ewlekariya kongrê dabûn ser milê xwe, bi radyoyên bê tîl bi hev re diaxivîn. Evî yekî gelekî bala Cîgerxwîn kişandibû û ji min re qal dikir digot: *Êdî baweriya min xurttir bûye, Kurdistan dê di demeke ne pir dûr de bê rizgar kirin.*

Gera me ya din bi hev re ber bi Sovyêtê bû. Çawa ji helbestên Cîgerxwîn jî diyar e, ew dostê Sovyete bû, pir dixwest welatê Lenîn bibîne, kurdên li wir nas bike. Piştî çend hewlan me ji bo heftyekî vîza tûristiyê wergirt û em çûne bajarê Lênîngradê (S:t Petersburg). Berî ko em biçin me xeber dabû mamoste Qanatê Kurdo, Ordîxanê Celîl, Tosinê Reşîd, Têmûrê Xelîl û hevalên din. Gava em li balafirgeha Lênîngradê peya bûn, mamoste Qanat li gel komeke mezin hatibûn pêşîwaziya me. Dema ku em li wir bûn, her roj Cîgerxwîn tevî programekî dibû û li cîhên balkêş digeriya. Êvaran jî kurdan ew vedixvandin malên xwe yan jî li hotela ku em lê diman, kom dibûn.

Li Însîtuta Rojhilatnasiyê li Lênîngradê, di beşa kurdnasiyê de Cîgerxwîn gelek kurdnas naskirin, wek: Zera Usif, Ordîxanê Celîl, Cemşîd Heyderî, Kerîm Eyûbî û kurdnasên rûsî. Qanatê Kurdo serokê vê beşê bû.

Ji Ermenistanê jî hin heval hatibûn ku Cîgerxwîn bibînin; wek Tosnê Reşîd, Têmûrê Xelîl, Prîskê Mihoyî. Şagirtên kurd ji bo Cîgerxwîn şeveke şahiyê amede kirin. Her tişt bi dilê Cîgerxwîn bû. Lê divê ez qala bûyerekê jî bikim ku dilê Cîgerxwîn pir êşandibû. Casimê Celîl li Yêrevanê diji-

ya. Ewî jî pir dixwest ku Cîgerxwîn bibîne, lê ji ber dijwariyên tenduristiya xwe nedikarî bê Lêningradê, Cîgerxwîn vexwend Yêrevanê. Cîgerxwîn jî pir dixwest ku biçê Yêrevanê û rewşa kurdan li wir bibîne û gelek kurdên ku wî nav û dengê wan bihîstiyê, nas bike. Bi daxawa maqamên Sovyêtê rê nedan ku Cîgerxwîn karibe biçê Yêrevanê. Ev yeka jî ji xwe paradoksa Sovyêtê bû, mirovê ku di hemû jiyana xwe de dostê Sovyêtê bû, nikarîbû li Sovyêtê bi serbestî bigere.

Xên ji van geran, Cîgerxwîn li hemû welatên Ewropayê ku kurd lê dijîn, gerya. Rêxistinên kurdan ew vedixwandin civînên xwe, şevên Newroze. Cîgerxwîn jî, bi rastî ji gerê gelekî hez dikir. Her çend carina tenduristiya wî ne li cîh bû jî, gava kurdan ew vedixwandin, nedigot "na".

Cîgerxwîn wek şaîr tê naskirin, lê wî li ser dîrokê û herwiha wek siyasî jî kar dikir. Tu dikarî hinek van aliyên Cîgerxwîn jî ji bo me hinekî ronî bikî?

– Bi serê xwe dîrok û bi taybetî jî dîroka kurd û Kurdistanê, gelekî bala Cîgerxwîn dikişand. Ez dikarim bêjim ku di vî warî de tu berhem tunin ku bi zimanê kurdî an jî erebî be û Cîgerxwîn nexwandibe.

Cîgerxwîn bi xwe jî çend cild li ser dîroka kurd û Kurdistanê nivîsiye. Heta niha 2 cild hatine çap kirin, yê mayîn jî li benda çapê ne. Herweha Cîgerxwîn hin berhemên dîrokanan li ser pirsê kurd û Kurdistanê wergerandiyê zimanê kurdî. Cîgerxwîn li ser folklorê kurdî û zimanê kurdî jî xebitîye. Wî li Zanîngeha Baxdatê dersên zi-

manê kurdî dane şagirtên kurdan. Him li ser zimanê kurdî, him jî li ser folklorê kurdî berhemên Cîgerxwîn hene.

Ji roja ku Cîgerxwîn şaş û cibe daniye, ketiye nav tevgera siyasî. Wî di destpêkê de di nav rêxistinên civakî de kar kiriye û bi xwe jî înisiyativ girtiye û hin rêxistin saz kirine. Di sala 1937-an de bi komek hevalên xweve rêxistina ciwanên kurd saz dikin. Cîgerxwîn di tevgera aşitiyê de cîhê xwe digre. Bi partiya kommûnîstan re kar dike. Di sala 1957-an de di nav rêzên Partiya Demokrat de cîhê xwe digre. Piştî perçebûna Partiya Demokrat, ew di rêzên Partiya Demokrat ê Kurdên Pêşverû de cîhê xwe digre heta roja ku serî xwe datîne. Cîgerxwîn herweha di şoreşa başûrê Kurdistanê de jî li cem Mustafa Barzanî beşdar bûye.

Cîgerxwîn li gel welatperweriya xwe mirovekî pêşverû bû, bi gotinek din komûnîst bû. Ev yek jî jê re bûbû muşkulake mezin. Komûnîstan ew bi neteweperestiyê suçdar dikirin û welatperweran jî ew bi komûnistiyê suçdar dikirin. Li aliyê din jî polîsan ew tim digirtin û dixistin zîندان. Cîgerxwîn gelek caran hatiye girtin û êşkênciyên dijwar lê hatine kirin.

Ew mele bû, ne...? Gelo aliyê wî yê dîn û baweriyê çing bû? Te qet li ser vê yekê pê re sohbet kir?

– Belê, Cîgerxwîn mele bû. Xwendina wê demê li Kurdistanê tenê li medresan dibû. Medresan jî tenê ilmê olê fêr dikirin. Çawa me diyar kir, piştî ku Cîgerxwîn di warî netewî de şiyar dibe, ew şaş û cibe datîne alîkî û şerekî xurt li hember desthilatdarên olê, şêx û me-



Dema Cîgerxwîn tê veşartin

lan li dar dixê. Cîgerxwîn ne li dijî olê bû, wî digot ol danîne ji bo ku di nav însanan de aşitî hebe, mirov mirovan tazî neke. Di civatan de dad hebe. Lê digot, ewên ku desthilatdarên olê ne, ol li gor menfeatên xwe bi kar tînin, ol kirine xecateke zorê. Ji xwe gava em li helbestên Cîgerxwîn hûr bibin, emê bibînin ku Cîgerxwîn şerê olê nake, ew her şerê desthilatdarên olê dike. Eger ne weha bûya ji xwe di civateke musulman de qedrê wî jî nedibû.

Cîgerxwîn li derveyî welêt, li Swêdê çû ser heqiya xwe. Te cinaza wî bir li welêt, li başûrê biçûk, defn kir. Tu dikarî hinekî li ser merasîma cinaza seydayê mezin Cîgerxwîn, bîranînên xwe bibejî?

– Berî berbangê têlêfona min lêket. Dengê aliyê dinê ji min re nenas hat. Ji ber ku ez pir xewî bûm. Lê xebereke reş dida, digot: *-Cîgerxwîn miriye. Baş*

tê bîra min, min reaksiyoneke xurt nîşan da û got: *-Cîgerxwîn çawa dimire?* Pêre ez hinekî hatim ser xwe û min ew deng nas kir, zavayê Cîgerxwîn, Mihemed diaxivî. Ez rabûm, min xwe hazir kir û bi lez ketim rê û min xwe gihande mala Cîgerxwîn. Bi daxawa ev xebera reş rast bû. Cîgerxwîn, di nav nivînê xwe de dirêjkiirî, çavên xwe girtûbû. Heta nivê şevê, wek hertimê li ser karê xwe bûye. Nivê şevê şûnda radizê, lê pir naçe radibe û dibêje wekî bêhna wî teng dibe, dilê wî diêşe. Keça wî, xwûşka Gulperî gazî tixtor dike, lê heta tixtor bê êdî dereng e, ew dilê mezin, ew dilê ku her ji bo kurd û Kurdistanê lêdaye, disekine.

Malbata Cîgerxwîn tev hatibû, tişteki mirov bike nemabû, em man li benda sibê. Serî sibê me gazî ambûlansê kir, ambûlans hat û meyta Cîgerxwîn birin morgê.

Li nêzî mala Cîgerxwîn me ji bo taziye lokalek girt û taziya Cîgerxwîn hefteyekî ajot. Min û hevalên din, me karê birina cinazê ji bo Kurdistanê dikir. Hevalên li Kurdistanê jî haziriya xwe ji bo pêşwaziya cinaza Cîgerxwîn bikin, dikirin.

Hemû haziriya me temam bû ku em meyta Seydayê mezin bibin Kurdistanê. Herdu kurên Cîgerxwîn, Kesra û Azad ji ber sedemên siyaseta dewlata Sûriyê nedikarîn li gel cinazê biçin. Lewra min haziriya xwe kir û li gel xanima Cîgerxwîn, xaltiya Kehla, herdu keçên wî, Sûad û Gulperî û herdu bûkên wî, Zekiya û Gulperî, me meyta Cîgerxwîn bir Kurdistanê.

Nîvê şevê em gîhan balafirgeha Şamê. Nêzî du hezar kurd hatibûn pêşwaziya cinazê. Me cinaze li Ambûlansêkê siwar kir û bi qedera bîst makînan em ketin rê ber bi Kurdistanê. Serî sibê em gîhan axa Kurdistanê. Di yare gelê kurd wê şevê ranazabû. Li herdu aliyên rê sekînbûn û li benda Cîgerxwînê xwe bûn. Konvoya me derbas dibû, ew jî bi wesayîtan xwe ve tevî konvoyê dibûn. Gava em ketin nav bajarê Hesîçe, keç û xortên bi cilên kurdî xemilandî, herdu aliyên cadda sereke girtibûn û lîlandina keçan bû û gul û şekir diavêtin ser ambûlansa ku meyta Cîgerxwîn dibir. Te digot qey bûkêk di nav bajêr de derbas dibe.

Hêdî hêdî em ji bajêr derketin û ketin riya Qamişloyê. Qamişlo ji Hesîçe heştê kîlometre dûre. Herdu aliyên vê rêyê bi traktorên, kamyonan, otobusan, eraban, motorsîkletan hatibû girtin. Di nav van wesayîtan de gelek wesayîtan leşkerî û polîsan jî bi çavê me



Hanefî Celeplî, ji bo Cîgerxwîn, bîranînên xwe dinivîsîne

diket. Kurdên ku di leşkeriyê û polis de kar dikirin, bi wesayîtan kar ve hatibûn. Ev riya, me di heft-heşt seetan de qedand û em gihan Qamişloyê. Li pergê Qamişloyê êdî derya însanan bû.

Li nav bajêr dibistan û hemû karxane hatibû dadan. Çi piçûk, çi mezin, hemû kurd li wir civiyabûn. Li gor heşabên ku hevalan kiribû, ji dused hezarî bêtir jimara wan. Êdî ji ambûlansê re rê namabû, gelê kurd meyta Cîgerxwîn bi sivikbûna perikekî li ser destên xwe birin ber mala wî. Ji ber ku wesayata Cîgerxwîn ew bû ku wî di baxça mala wî de veşêrin.

Piştî ku cinaze Cîgerxwîn hate defn kirin, li paş mala wî konek hate saz kirin. Taziya Cîgerxwîn di bin konê de berdewam kir.

Gelo ger tu bixwazî karektêra Cîgerxwîn bi sê gotinan ji xwendevanên Bîrnebûnê re bidî nasîn, tu dê çi bêjî?

– Welatparêz, demokrat, aşitîxwaz.



- Cûmê xwe cûyîye li eniyê xwe dayê.
- Nermik e bi darmik e.
- Şor tîr kir mal bîr kir.
- Tir bûhar bû.
- Tu ci bû yî xiliza ku ber bê dikeve?
- Ji qahra, kete bin bara.
- Mirîyek pir şuştin ê tira bike.
- Para bûkê pêre tûke.
- Piştê bizinê xurî a nanî şivên bixwe.
- Qûna xwe ji derpê derxist.
- Serê xwe şuştiyê enîya xwe hilmaştîye.
- Ji Şîrî heta Pîrî.
- Westîya kir vesiya xar.
- Xwedanê sebrê, bûye mîrê Misirê.
- Ker û bergîr li cem hev girêdan, ê ji hevdû tir û fisan biêvîsin.
- Bîr bi bêndira tijî nabin.
- Me merên xwe kişandin şûna peran em poşman bûn mîna keran.
- Kala dikin çala, pîran dikin bîra
- Berxê çê li ber kozê ye.
- Bi benî xelkê xwe bermede bîrê.
- Bi çukê malê kuçikê malê.
- Bûka bere, bûka bere, ê niha ninge min neavête ser kerê.
- Bûka li ser hespê kes nizane qismeta kê.
- Wexta te kir qîje qîj, min zikê xwe kir pîj.
- Çi tu bûyî bayê ber baranê?
- Berxê çê li ber kêrê ye.
- Mangê kû bi şev hate ga, a bi ro jî bizê.
- Fêdê çavekî bi çavekî bibûya, poz li navberê dernediket.
- Zikî têr hale ji zikî birçî neye.
- Kerê xwe qût girêde ma gur nexwe.
- Berîya dêynderan a tim qûl be.

- Delkê kire hewtê hewt, kûçke ji halêwê (Halep) werin.
- Hespî çê qamçî di xwe nagîhîne.
- Pîrê nemire biharê tê.
- Te mina mişkî kûr, xulî li ser xwe kir.
- Lingî xwe meke kurîyê agirî kesê.
- Li ber vesê Pêla mîne bîrê dizan!
- Birçîyo birçîyo, te birçîyê me ne dî?
- Ruto te rutkê me nedî?
- Dew birayê mêst e.
- Çi tu bû yî, xweng a kû, cewrik berhev xistine!
- Çi tu bû yî dînkê ku dîndûq dîyî.
- Barê serîyê sivik, linge bikişînin.
- Ser tîn e, bin qamêl e (qamêl=gemar).
- Devî terê vemeke, kurikan birçî meke!
- Sîpik bar kirine, kerê gotîye ka bare min?
- Te palek avête kuçikê xwe xelkê du pala biavê.
- Dûre bi nûre, te çî kir xwelî li serê xwe kir.
- Tu bûyî masîyê ku av li ser miçîqî.
- Mer mer e, qe ne cêla ker e.
- Ga mir, kêr dê lê pir bibin.
- Qûnê mirîyan bi halawe.
- Pêçîya kul tim li kevir e, serê xweş balgî nagire.
- Ji bo xatira, bixwe goştî qantira.
- Ê te kirî, bi heft baranan nêşuştine.
- Serê şikestî di bin kûm de ye.
- Negere li erdî kaş, nebîne xewnên şaş.
- Çav li derîya xwelî bi serîya.
- Çi neçê ye, para kecê ye.
- Dengê dolê ji dûrva xweş te.
- Dînek ê kevirê bavê bîrê, heft biaqil nikarin derxînin.
- Ma ez ne biçukê bira bim, kuçikê heft kerîya bim.
- Çukê merîya, kuçkê heft kerîya.
- Erew (arap) bê kar be, ê tapan a hiştira qatran ke.
- Erew bi erew re gotîye; "magî reş o".

AVAKIRINA LOBÎYAN

Xwendawanên **Bîrnebûn**'ê bi rûmet! Di destpêka nivisa xwe da, berê silav û rêzên (hurmet) xwe ji we ra pêşkeş dikim û havîneke bi xêr, pêşerojeka bi xwaşî û bextewer dixwazim.

Wekî wûn jî dizanin, va 5 sal in bi fedekarîya çend xwandewan û zaneyên me, kovara me ya tarîx (dîrok) û kulturê; **Bîrnebûn** derdikevê (Bi vê wesîlê ji wan kesên ku keda xwe dayînî ra destxwaşiyê dixwazim). Pir kesan ji me bi vasita Birnebûn'ê hevdu naskir û bi hevdu ra kultura xwe pêşda bir. Disa; ji boy ku va kara berdewam be, sazîyên (ênstitut) xwe yê wekî Wakfa Kurdên Anatolîye li Swêd'ê û Komela Kurdên Anatolîye li Almanyê avakirin. Hêvî û daxwaza min ew e ku, sazîyên wekî vanan, li welatê din jî yên Avrûpa û li Tirkîyê ji bên sazkin. Fida wê ewe ku me tîne ba hevdu, ji me ra rîya hevdunaskirinê û bi hevra-karkirine vedike.

Wek tê zanîn, çi li Tirkîyê be çi jî li welatên Avrûpa be em hendikî (mînorîte, azinlik) ne. Lê ne tenê em di vê rewşê da ne, wekî me pir gelên (xalk)

din jî hene. Va rewşê em têda, çiqas ji wekî dezawantajekê xuya bibe jî, ji mera avantajeka pir mezin e. Ji ber ku em civateka biçûk in ji boy vê jî em, hevdu bi gund gund, bi malbat malbat nasdikin. Va jî ji me ra awantajeka pir girîng (muhîm) e. Dibe em vê awantajê xwe bi karbinîn.

Erê lê emê çing vê awantajê bi karbinîn?

Bersiva min ew e ku; Ne hewceye (pewiste) em Amerika careka din jî kewş bikin. Em jî dikarin wekî henek hendikîyên din xwe organize bikin. Vê jî dibê em bi pêkeling-pêkeling (basamak-basamak) bikin. Wekî me li Swed û li Almanyê destpikirî; berê di wakif, û komeleyên kulturî-civakî (sosyal) da xwe organize bikin. Di pêkelinga duduya da; Dibê em bi hevdu ra tîcayetê bikin û hevdu dewlemend bikin. Dewlemendbûn, di pêşveçûna kultur û civakê (toplum) da şertê esasîy e. Di pêkelinga sisîya da; Dibê em di komeleyên karî (meslekî) û di partîyên sîyasî da aktiv beşdar bin. Bi rêz, herkes lê gorê dîtin bawerî (inanç) û menfaata

xwe. Lê ne yêk bi yêk bi serî xwe, jiber ku giranîka me hebe, pir-pir girîng e (muhîme) ku wek grûp di van organîzasyonan da beşdar bin û bi gelên din ra bêna hevdu û bi hevra kar bikin.

Di vî warî da dixwazim gotinên xwe çilkekê aşkere bikim. Gotinên min ev in ku; dibê em di nav xwe da bi pir rengî û bi pir dengî bin û mezin biçûk ji hevra bihurmet bin. Lê di nav orgazîsyone ku em tîda beşdar dibin, dîsa dixwazim bêna pir girîng e (muhîm) ku em bi hevra hereket bikin û bi yêk dengî bin. Bi vî rengî, em ji nav xwe rêberan helbijirin, yan jî wek grup em dikarin bi awakî demokratîk liser rêberan têsîr bikin. Dîrok (tarîx) nîşan dide ku, di tu civaka da û tu caran, tehekûma rêberan li ser grûpan çê nebûyê. Tehekûma rêberan li ser kesên (şexis, îndîvîd) çê dibe. Lê têsîra grûpan liser rêberan mutlaq e. Ev têsîrê ku em li ser rêbera bikin, ya bibe têsîraka li ser îxdîdare, ev jî ya me him jî alî aborî (ekonomîk) him jî alî civak û kulturî da pêşva bibe. Qesta min ji rêberan ev e ku, evê di nav me danê û ji nav me bêna helbijartin. Ne ew kesên ku kurd in lê, bi navî xwe û bi serî xwe hereket dikin, yan jî evên ku ji alî henên din tîna helbijartin. Ji ber ku ev kesana yan jî xwe ra, yan jî ji kesên wana heldibjirin ra dixwedibitin.

Ez dizanim ku va gotinên min dikarin şaş jî bêna fêmkirin. Ji boy wê jî dixwazim bêna, armanca min ne ewe ku, li vir nijatperestîyê (şowenîstîyê) bikim. Na; Ez ji boy ku em herdem di binda nebin, ne hêlin û com nebin. Ez bi kurtî vê dibêna, va ji boy menfaatê me yê, menfaata me ya şexsî û menfata gelî me yê. Xwe fikirîn, tu cara ne şerme (eyîb). Heta ev ji me ra misyonê neke, ji boy pêşeroj û nesilên (generation) me têtîyê. Ev misyona boy herkesî him vasîfeyê û him jî ferz e. Ez dixwazim em bi serketî û serfiraz bin. Erê, ez dixwazim; Em li kîjan welatî dibin bila bibin dibê em lobîyan çêkin. Lobî avakirin jî li tu welata ne qedexeyê (yasax). Di ber me pir hendîkîyan lobîyên xwe avakirine û pir jî bi serketîne. Dîsa dixwazim bêna, hevkarîya me ya di lobîyan da, me ne ji kurdên din û ne jî ji gelên din bi dûrdixe. Wekî ronakbirê me yî bi rêz Nuh Ateş jî gotî; *"Meriv çiqas jî global bifikire, dibê bi lokalî bixebite."*

Wek tî zanin va kara ji wekî pir karê din, dibê berê ji xwandewan û ronakbirên me da dest pê bike û paşê ji wûrde wûrde bigêje pîranîya gel.

Bimînîn di xwaşîyê da, şad û bextewar bin.

28 Gulan 2003



Firoşerê Şevê*

Berî ku ez li havîna 1996 biçim Tirkiye dê û bavê min di telefon de bi min re digotin ku ez li ber pozê wan mîna gulek bîhn tidim. Lê piştî ku ez ji hepsê derketim ji wan dixwast ku ez wextîna bi şunda herim Swissre ye. Tevî ku dilê wan bi xirab ji dibû, digotin: "Here, çiqas zû bi dest tere te, ewqas rindtir e!" Ew însanên mezin ditirsin ku ezê dîsa bêm girtin yan ji tiştên dine xirab bên serê min. Gotina kin: Ew tecriba dilêşîkek ku çil salî naye bîrkirîn bû.

Sê heftên min, ezê ku hemwelatî Swiss bûm, her tişt ceribî ku derkevim der û herim welatê xwe yê diduyan. Digel ku du pasaportên min ji hebûn, polis ez du caran li balafirgehê bi şunda wegerandim, ji bo ku navê min ji compûter hin dernexistîbûn. Kaxiza mehkema ku ez ji zindane berdâm û qirar da ku ji bo derketina mina der qet tu manî tunin, li cem polis penc pere nekirin. Ji min re gotin ku derxistina navan ji compûtera polisîşixula "Emniyet Genel Müdürlüğü" ye. Polisêkî xort li balafirgehê bi xwe bi tirkî û aşkara got: "Bira, eger tu hezar Mark nedî, navê te di compûter de dimîne!" Mesele li dawî hal bû... Ne hûn bibirsîn çawa hal bû, ne ji ez ji were bêjim.

Rojekê di ber hatina mina Swissre ez çûm Enqere. Roja din sibê divê em carekê din biceribin. Min hewalên xwe li Enqere dîtin, wan ji min re li ser

navên xwe li Kizilay e odayek li otelê girtin. Eger kesek bipirse, ez li vir tune me! Me tev hev nan xwar û, bi gotina me, me tir kirin gowend. Piştî ku wan ez birim otelê heriyek bi lêz çû mala xwe – min texmîn kir ji bo çî ewqes ecele ew çûn.

Evara dereng min dixwast ku ji keçika xwe re telefon bikim û ji wê re şevak xweş hevî bikim. Ji otelê da min nedixwast ku telefon bikim, hingê şopa min li vir dima. Ez çûm der ku li qabina telefon bigerim. Li parka ku tişî însan, tê bêtî ku meşher li vir gihîştîya hev, min qabinek dît, li kêleka wê ji xortên hîn deh-danzdeh salî jetonê telefon difrotin.

Telefon wê êvare bi înat bû, welhesil derneket. Ez çiqas ber xwe ketim, li vir nayê gotin, ew meseleyek bi serê xwe û dirêj e. Xortek ku min ji jeton şandîbû dora deh salî bû û du karên wî din ji hebûn: bi sepetê dendikê gula difrotin û bi qenterê, ez bawer im her mala li Ewropa yek ji wan heye, wî bi pere kîloyên însanan dikşandin. Demekê kurt rêzek ji li ber qentera wî çebû.

Min li vî xortî mêze kir mina ku ez li sînemayê bûm; îro ez nikarim çend salan bi şunda rindî û nadira li ser wî bi kelîman bînim ziman. Ji her mêt yan ji jina ku di kêlaka wî re derbas dibû, ji dipirsî ka ew tiştan distîne. Ez carek ji bi keniyam wexta ku wî bi devkê kurdî ji

* Ew maqale cara sifteh bi Elmanî di kovara *Caritas* de hatiye weşandin.

jinike re got "Abla, kilon biraz fazla, gel tartayım!" (Xwenge, kîloyên te hindik zêde ne, were ez te bikşînim).

Wî xortî jîyana tucariyê pir zû naskirîbû. Nezera wî ya kûr gerek nedikir ku bi gotinan bê ziman. Ez mîna navê xwe dizanim ku ewê bi min bikeniya, eger min ji wî re bigota ku qanûnê Neteweyên Yekbûyî (UNO) hene yên ku karkirina zarokan qedexe dikin. Heye ko wî, yek ku mîna neçirwanekî di pê mişteriyên dibezî, bigota ew mêrika dîn û dîwane ye. Min paşînge heyne pêş xwe ku ez bi wî qehremanê xwediyê sê îşa re têkilî daynim û bizanim ka çi li paş wî veşartiye.

Digel ku xortê ku navê xwe ji min negot ji deng kirine hêz dikir, bi wî re têkilî daynin ne hêsa bû. Min jî navê xwe negot, ez ne bi navê xwe li vir bûm. Wî cesaret kir ku bi min re Kurdî ji deng bike. Heta ku min çîroka wî bi alî xwe xist, bawer bikin, saatek derbas bû, bi çi awayî be wî çîroka min bere hewisî. Li ser pirsê wî ye yekten ma ez ji wî re ji Swissre tiştan bibêjim, min ancax got ku hemsaliye wî aniha razana, bêlki di xevêk kûr dana. Wî qet tişt negot, berê xwe da mêrikekî qelew û ji pirsî ka ew xwe dikşîne yan ji na. Wexta ku mêrik guh neda wî, xort li min vegeî û pirsî ka min maça Galatasaray bi Xamax re temaşa kiriye yan ji na. Min ew maça nedîtîbû, bawer bikin, xebera min ji ji we tune bû. Xort mat ma û pirsî: "Du ne li ve dinya yî?"

Heta nîvê şêvê me qise kir. Ez mecbûr bûm biçim otele ji bo ku ji saet danzdeh şêvê bi şunda derî kilit dibin. Xort li parqê ma, mişterî ji pek nadir

dihatin.

Ew xorta du salan ber ve hatî bû Enqere. Wî xwedî li dê û sisê xwengên xwe dikir, debara wan bi wî dibû. Nêzika dawî sihbeta me wî li ser pirsê min got ku bavê wî, yek taqriben li sala min bûyî, hatiye kuştin. Wî ji negot çawa, min ji nepirsîm. Bavê wî elektrîkvanê gund bûye. Dengê silah û şer her roj li dorali gund tişteki hu bûnî biye. Wexta ku mêrê gund, ye ku piştî şerekî wusa di navbera gerilla û eskeran de bû gumana alikariya ji gerilla re ji aliyê eskeran de hatin girtin, sê roja nehatin berdan, yekî gundî mayin çûye qereqol ku aqîbeta girtiyan bi aliye xwe de. Lîstayêk mirîyan danîne destê wî, piraniya wan ji eqrebe bûne.

Tabî sawcî lêpirsînek vekiriye, lê ew dosya ji mîna hejdeh hezar dosyên din li rafên mehkema DGM li Diyarbekîrê toz digire. Piştî ku serxweşî qediyê, diya wî qamyonek digire û bi mal û zarokên xwe re diçe Enqere cem birayê xwe yê ku berî çend salan çûbû vir. Birayê wê "korucitî" qabûl nekiriye, ji bo wê ji mecbûr maye ku gundê xwe biterkîne.

"Îro em dikarin bibêjin, xalê min bi aqil e. Lê wexta ku wî mal û milkê xwe yê pir li gund cihîşt û çû Enqere ku li vir emeletî bike, gundiyan bi wî qirf dikirin, ew eyibandin, ji wî loma kirin."

Li odeya otelê ku ez ne bi navê xwe raza bûm û xwe zor dida xwe ku bikevim xewê, min demeke dirêj li ser dîmensiyona wî şerê ku li welat hebû fikr kir. Dawiya wî şerî bi min mîna hewcekî avêtina şefeqê xuya kir.



DÎK Û ZÊR

Çi hebûye û çi tunebûye. Li gundekî mêrek û jinek hebûye. De tu were, mêr û jinik ji jiyana xwe pir kêfxweş in, lê dîsa jî dilên wan de birinek hebûye. Zarokên wan tunebûne. Her sibe û şev jinik li ber xûdê geriyaye û gotiye:

– Xûdê xûdê parçekî goşt bide me ma pê mala min ronahî bide, ma ev dergûşa, rûyö me reş-sipî bike. Roj, meh û sal zû darbasbûne zivistan û bûhar serhevketine rojekê ji rojen ev jina bi dûcana bûye. Her roj zike wê jinê lê gir bûye û edî ev zika heta bîlîve wê hatiye. Mêr û jinik ji bo we pir dane. Roj, meh û sal zû darbasbûne. Zivistan û bûhar serhevketine Rojekê ji rojen ev jina ev dergûşa anîye rû dînê. Lê ev dergûşî hatiye rû dînê ne mina ma ye: Ev dergûşa dîkek bûye. Mêr, jinik û gundiyan bi vî halî şaş ma ne û dîsa jî jin û mêrik ev dîka mina canî xwe heskirine û ev mezin kirine. Roj, meh û sal zû darbasbûne Zivistan û bûhar serhevketine Rojekê ji rojen ev Dîka li ber dê û bavî xwe sekiniye û gotiye :

– Dîya min û bavî min delalo, hûn edî pîr û kal bûne. Ez jî edî mezin bûme û ez dixwazim ji we re kar bikim. Dê û bavî wî bi gotinên Dîk şaş ma ne û wan li çavên hevûdû meze kirine. Bave ji Dîk re got:

– Lawî min delal, ev gotinên te dile me gelekî xwaş kiriye lê tu jî dizani ku tu Dîkekî û tuê çawa bikî? Dîya wî jî ji Dîk re got:

– Dîko ezê xwe ji te re bikim cil, ez bi qurbane te me dîko tuê tu karî nikarî

bikî. Wan ji sibe hate şev berhevdu dane û paşe bavî wî ji dîk re gotiye:

– lawê min ê delal, guh bide ser min, bavî min berê berê de zêrek dayî bû Mîre Mîsirê. Tê herî cem wî û zêrî me binî. Karî tu ji me re bikî va ye. Sibê bûye. Bav û dîya dîk ji hevûdû xwatire xwe xwastine û Dîk ketiye rê. Roj, meh û sal zû darbas bûne. Zivistan û bûhar serhev ketine. Ev Dîka hindik çûye pir çûye. Li ser rîya dîk gur û rovî cîh girtine. Gur û rovî çavên xwe berdane dîk ku wî bixwine. Wan ji Dîk re didanen xwe tûj derxistine û lingên xwe pêşi di herdê dane. Dîk li derûdore xwe mez kiriye kû bireviye. Lê kuve bireviye. Dîk ne difiriye mina çûçiken awra ne jî ji gur û rovi baştir dimeşiye. Dîk ne meşiye û ne jî firiyê. Lê dîk bê tirs qûna xwe çaxe (zivirandin) berî wan kiriye û wî ji qûna xwe re gotiye:

– jilhev be Qûno jilhev be gur û rovî ve dikişe. Dû re qûna dîk lê gir bûye mina telîsekî lê vebûye. Gur û rovî bi wî halî şaş ma ne û gotine:

– ”lo lo lo ev çi qûna ku li wî ewqas gir dibe.” Çav li wan bel bûne. Li germa havîne wan cirifîne. Dev li wan mina çalekî vebûne. Tirs kete piştta wan û çok li wan sist bûne. Paşe qûna dîk mina miqnatîsê gur û rovî kişandine hundirî xwe. Gur û rovî kirine qjjeqij û xwe li erde xistine û bi keviran û bi daran xwe girtine û disa jî wan ji kişandina qûna dîk xelas nebûne. Dû re gur û rovî mina belî derzîyê zirav bûne û paşe hêdi hêdi ketine qûna dîk. Dû re qûna dîk lê çûk bûye

û mina berê hatiye girtinê. Paşê dîk berî xwe daye roşhilat û ketiye rê û kilamek ser xwe gotiye:

-”lo lo Dîko Dîkî paqilo
çav zerko boç sorke
dile keçiko şewitand
we ne yeke we ne dudu ne
malê xizanê ocax kûr kiro”

Hindik çûye pir çûye. Li ser rîya dik çemek hebûye. Dîk xwastiye kû biçûye hêla din lê li ser çem ne pirek habûye ne jî dîk ajnî dizanîye. Dîk li çep û rastî xwe mêze kiriye ku ev çemekî gelek dirêj e. Dû re dîk bê tirs qûna xwe çaxe berî çem kiriye û gotiye:

-”jihev be qûno jihev be va çema di-kişê”

Dû re qûna dîk lê gir bûye mina telîsekî lê vebûye. Çem kiriye humehum, gumegum û pêlên xwe li xwe gij kirine û mina çiya Sipane ew serhevûdû xistine ku dîk ji xwe tirsandin bike lê dîsa jî ew ji qûna dîk xelas nebûye û ev çema wekî derya bûye çilka baranê û hêdî hêdî ketiye qûna dîk. Dûre qûna dîk lê çûk bûye û mina berê hatiye girtinê. Hindik çûye pir çûye. Dîke minî çav zêrik û boç sorik. Li ber konaxa Mîre Misirê sekiniye. Li berbangî li serê gir bangkiriye:

- Girgiriîîî lo mîrî Misire yo! lo Mîrî Misire yo! Berê berê da kalî min zêrek dabûye te. Ez wî zêrî kalî xwe ji te dixwazim. Mîrê Misirê bi qirîna dîk ji xweva kûr bi hirsekî rabûye û gotiye:

- Ev kî ye? Ev î ku min ji xewa kûr rakirî î n e û cîn e? Pîrike an jî tebêke? Xûlamên Mîrê Misirê bi lêz ketine rêzê û yekî ji wan gotiye:

- Li me biborîne ezbenî, evî we ji xewa kûr rakirî Dîkek e. Me ev kevir kir,

paşê me ev da ber şûr û tîran û lê dîsa jî li ber konaxa te naçû. Mîrê Misirê bi dengekî hêrs ji wan re got:

- Bêjin ev dîka ji min çi dixwaze? Xûlemekî got:

- Li min biborîne ezbenî, ev dîka ji me re got ”berê berê de kalî min zêrek dayîbûye Mîrê Misirê û ez wî zêrî kalî xwe dixwazim”. Mîrê Misirê bi dengekî hêrs got:

- Ew kî ye kû deynî xwe li min maye? Ez im kû Mîre Misirê me tû kesî deynî xwe li min tûneye. Wî dîkî biavêjin nav ga û mirişkan kû ma pêlînin û likunkin. Çiqas kolê konaxê hebûn gişt tevhevûdû ketine dû dîk. Kolên konaxê di xûye de reş bûne û xûzî devî wan de nemaye. Ziman li wan reş û dirêj bûye. Paşê kolên Mîrê Misirê ev Dîka girtine û avêtin nav ga û mirişkan. Di bin lingên ga û golikên de ev Dîkî lepek zanî kû çi ware serê xwe û bi lêz qûna xwe çaxe berî wan kiriye û ji qûna xwe re gotiye:

- ”jihev be qûno jihev be gur û rovî jê derkeve”. Dû re qûna dîk lê gir bûye mina telîsekî lê vebûye. Ga û mirişkan kirine vaxevax û gîgîgîk kû jî dîk birevin lê kû de birevine, deri û taq hatine girtine. Bi lêz gur û rovî ji qûna dîk derketine û xwe avêtine ser ga û mirişkan. Hinek birindar kirine û hinek jî li xwe bar kirine û herdû yek dareke de revine. Sibe bûye. Kolên Mîrê Misirê hatine axur. Çi bînerin; ga û mirişkên xwe gişt hatine qirkirine. Kolan bi lêz û bi tirs li hemberî Mîrê Misirê sekinine û gotine:

- Li me biborîne ezbenî, ev Dîka ga û mirişkên me qirkirine û yen mayî jî wî xwariye. Mîrê Misirê hinek ji wan gotinên tirsîya û di ber xwe de gotiye; ”lo ev çi dîk e kû ga û mirişkan bixwe. Lo ma ev ne hirç be?” Mîrê Misirê ji wan re got:

– Wî dîkî biavêjin nav arekî gir kû ma bişewite. Kolên Mirê Misirê li ber konaxê dar û bar danîne ser hevûdû mina çiyakî bilind kirine paşê ev derbarên vêxistine û ew dîka girtine û avêtine nav êr. Ji Dîk re ev agira çi ye? qet ne tiştek e. Dîk bê tirs ji qûna xwe re gotiye :

– ”Jihev be qûno jihev be Ev çema jê derkeve” Dûre qûna dîk lê gir bûye mina telîsekî lê vebûye. Dar û bar kirine vista-vist, cistacist û ji hevûdû revîne. Agir jî ji tirs ra sor û zer bûye ku dixwast xwe biavêje ser dîk lê agir, dar û bar dîsa jî qûna dîk xelas nebûne. Ev çema ji qûna dîk derketiye û agir vemirandiye. Kolan bi lêz û bi tirs li hemberî Mirê Misirê sekinine û gotine:

– Li me biborine ezbenî, ew dîka ev ara bi tûkirine vemirand. Edî Mirê Misirê kûr kûr fikiriye û gelek ji dîk tirsîya û di ber xwe de gotiye;

– ”lo ev çi dîk e kû ar bi tû kirina xwe vemirandiye. Bi xûdê ev dîka, e min jî di tûkirine xwe de fetîsîne.” Mirê Misirê ji wan re got:

–Guh bidin ser min. Em jî wî xalas bûn. Wî Dîkî dikin hundiirî odeya xezîne û ma zêrekî xwe bibe, paşê ma ji vir bicehime. Xûlamên Mirê Misirê dîk girtine û ev avêtin hundiirî odeya xezîne. Dîk çi binere, ode hate dêv ji zêr û zîvan tijî ye. Her derek ji zêr û zîvan biriqiye û ji biriqîndane wan oda xezîne şewq daye. De bizane Dîk na çawa bike? Zêr û zîv ne yek e û ne jî dudu ne. Dîk yekê dike devî xwe biçê lê çawên wî li paş bimên. Dê û bavê wî hatine bîra wî. Dîk ji xwe re gotiye:

– ”Em ê edî dewlemend bibin û xûlam û kolên me jî hebin. Ezê edî bi wan zêr û zîvan ji dê û bavî xwe re qonaxeke çêkim” Paşê Dîk ji qûna xwe

re gotiye:

–”jihev be qûno jihev be. zêr û zîv di-keve”

Dûre qûna dîk lê gir bûye mina telîsekî lê vebûye. Zêr û zîvan kirine şeqaşeq û reqareq ku ji hundir derkevine. Zêr û zîv ji dîk xelas nebûne û ev ketine rêzê paşê yekûyek ketine qûno dîk. Ji zêr û zîvan yekî xwe kiriye quncik, xwe li ber dîk bêl kiriye û li çavên wî nêriye. Ev yeko jî, dîk kiriye navbera nikûla xwe û derketiye der.

Dîk bere xwe daye rojava û ketiye rê. Roj, meh û sal zû darbas bûne. Zivistan û bûhar serhev ketine. Hindik çûye pir çûye. Dîk berî xwe tim dayiye rojava. Edî li mala xwe vegeriye. Dîk nezîkî gundê xwe bûye. Derketiye serê gir û gotiye:

– Girqiriii.....Dayê! dayê! Ez ji qazance hatime amadeke odê mîvana. Deri û pençeran bigire. Belî tu biavî sûyê min bi dar da ke. Barî min ji zêr û zîvan e. Ma pê çavên te bibiriqe.

– Girqiriii.....Bavo! bavo! Ez ji qazancê hatime. Di dest xwe ke çokî xwe. Ji qûna min vekîşê. Ez bêm yek du bê dudu. Hetek zêr û zîv jê diavêje.

De û bavî dîk bi dengî wî kêf dane û gotinên lawê xwe bi lez cîh anîne. Dîk hatiye mala xwe. Ketiye odê mîvana. Dîya wî ew bi dar da kiriye û bavî wî jî bi çokî xwe ji qûna wî vekîşiye. Her ku bavî wî li qûna wî xistiye, ji gûna wî, zêr û zîv yekûyek ketine. Bi şaqashaqan û biriqandina zêr û zîvan gûh û çavên dê û bavî dîk kur û kêr bûne. Çav li wan gir bûne û lê birîqîne. Wan destên xwe avêtine zer û zîvan li ber çavên xwe gerandine ku ev tiştî ji qûno dîk dikeve rast e an jî xewnek e. Bavê di ber xwe de got:

"lo ew çî hal e ew çî şar e
şev û roj li hevdu qelivîne
qe tunebuna van zêr û zîvana
Hêş li serê min nemane"

Daye jî di ber xwe de got:

– "Gundo rabin ji xewa sibe. Qor bi qor dikevin rêzê. Ez jina şivanekî bûm. Ezê we têr bikim bi zadî rizê" Odeya mîvana ji zêr û zîvan tişî bûye û dê û bavî ew kirine çalan. Roj, meh û sal zû darbas bûne. Zivistan û bûhar serhev ketine. Jinêk û mêrik devlemend bûne. Hezaran ji ga û golikan. Hezaran ji mîh û beranan. Li ber qonaxan wan. Ji sedan xûlam û kolan. Rojekê cîranek wan hatiye cem dîya Dîk. Wê ji dîya dîk re gotiye:

– Le xwuşka minê delalê ca ji min re bêje hûn çawa devlemend bûne? Dîya dîk ji cîrana xwe re ji serî heta dawî qal kir û cîrana wê ev gotinan kiriye serê xwe. Ev cîrana li ber xûde geriyaye û wê gotiye:

– Xûdê xûdê ez ji te dîkekî dixwazim. Mala min xizan ma pê bibe dewlemend. Ma ga, golik, mîh û beranen me jî hebin û li ber qonaxê me ji sedan xûlam û kolan jî bîn. Rojekê ev jina dûcane bûye. Wê pê mêrî xwe ve gelek kêf dane. Meh zû derbas bûne û ev jina dîkek anîye rû dûne. Dîk mezin bûye. Rojekê dîk li ser kûlingê listîye û xwelî nikul kiriye. Dîk di nav xwelî de zêrekî diye û ev zêra biriye cem bav û dîya xwe re. De û bavî dîk ji bo ve pir kêf dane û odayê mêvanan ji lawî xwe re bi lez amede kirine. Lê Dîk bi halî wan şaş maye û ji wan re gotiye:

– Bavî minî delal, dîya minê delal, min ji we re zêrek anî lê hûn ji min re odeya mêvanan ji bo çî amede dikine? Bavî Dîk ji re got:

– Lawî min delal em edî devlemend bûn û ez ji xizanîye xelas bûm. Dîya Dîk jî got:

– Ez qurbane te bim Dîko, ji qûno xwe re bêje û ma zêr û zîv ji qûna te bikevin. Dîk ji wan re got:

– Ê min ji we re anî zêrek e. Di qûna min de tu zêr û zîv tûne û ez jî qûna xwe çî bixwasim ku çî heye? Dê û bavî dîk ji sibê hate şev bi gotinên xwe kirine û paşê Dîk ji wan re gotiye:

– Min ji we tiştek fêm nekir lê dîsa jî ez ji qûna xwe re carek bêjim ku zêr û zîv dikevine an jî tiştekî din dikeve ez nizamim. Dê û bavî dîk pir kêf dane ku ji qûna dîk zêr û zîv bikevine û wan çavên xwe berdane qûna dîk lê mêze kirine. Dîk bê çare ji qûna xwe re gotiye:

– Lo qûno! Jihev be û zêr û zîv jê derkevin. Qûna Dîk lê sor bûye û lê heşin bûye. De tu ware qûna Dîk ne lê gir bûye û ne jî lê vebîye. Dîk bê çare dîsa ji qûna xwe re gotiye:

– Lo qûno! lo qûno! Jihev be û zêr û zîv jê derkevin. De û bavî dîk jî bi hevûdû re ji qûna dîk re bang kirine:

– Lo qûno! Jihev be zêr û zîv jê bikevin. Paşê qûna dîk lê hinek vedibe û de û bavî wî çî bibinin, Ji qûno dîk zêç û gû derketiye. Ev zêç û gû pişikîye serûçavên dê û bavî dîk. Ji zêç û gû ev odayê mêvanan têji bûye.

Çîroka min li wir qetiya. Yek ji we re yek ji min re. Iskanek şîr ji me re. Æv kete erde. xewikek xweş ji we retidîk û pitikne pîrik û ne jî têbîk zarok ketine xewe xewneke xweş ji we re.



HÊVÎYÊ BERHEVKE

Çi dibe çi nabe
Bîrîndar dikevim
Mîrin dibe
Şevên bi hîv û ronahî
Xwîn dibarînin
Tarî dibe
Dilê min ji sîngê min derînin
Bidin dest zarokan
Wek bûka baranê bigerînin
Tu jî
Ji dengên dergûşa ji lorîna
Ji ramûsanên keçên bedew
Ji lêvên bûka yên bê av qeliştî
Hêvîyê berhevke
Bipişqîne şevê tarîyê belavke.

MEM XELÎKAN

RÎNDÊ

Paçkim rindê ti heniyê da
Ro biriqî ti çavan da
Gûl webû di lewa da
Gûlîstan bû di dili min da

Herim rinde herim
Niha xwe bi rû te dim
Serîyê xwe bi ser sîngê te dim
Xewê sibe li ba te bikim.

Efe Apaydın

DÎLO

Dilo megrî bihar tê
Ji Xelika da xêber tê
Diben rêwîyek ketiyê rê
Ji yarê da dismal tê

Dilo menale ev çi hal e
Xeribî pir zeval e
Bist salan ez je dur im
Hin arê dil venamirê

Dilo li Karakullik* zivistan e
Li ser tandurê ar dadane
Evîndar dile xwe şa dikin
Te şa nekir xerib dilo

Kemal Harımcı

LÎ WE DINÊ

Hen ketinê pê parîyêk nan
Hen zikê xwe têr dikin bi derewan

Hen di dozê da ne wek şêran
Hen xwe vetêşerin ji tirsan

Hen par dikin parîyêk nan
Hen çilekin têr naxin ji goştan

Hen xwedîyê pere ne lê tim xizan in
Hen bê pere ne lê pir al dan

Hen her dem bi her tiştî dizanin
Hen xwedîyê îlm in lê bê zar û ziman in

Hen ti rîya xwedê da terin giran giran
Hen tibeziin lê li nîvê rê tebin poşman

Weng çerx di be çerxa cîhan
De bejê hevalo ka tu kijanî ji wan herduyan

Kemal Harımcı

*Navê yaylakê li Xelikan (Gölyazi)



TU

Mejiyê min li serxoşbûnê digere
Dile min dixwaze di dunya çirokan da wenda bibe
Dixwazim xemên rojane bi pêtiyên agirê eşqê bişom
Piştî çend salan bi şûn da
Tu hatî bîra min
Te
Heyecana jiyana ku min ji zû da bîrkiî
Bi şûn da da min
Te
Pêti bi koziyê dilê min xist
Te
Tahma ciwantiya min teze kir
Mala te ava be.

MIN

Min li ba te xwe naskir
Min dilê xwe bi kenê wan rojên biharê xemiland
Min ramûsanên te wek helbestekê li mejiyê xwe raçandin
Min xwe pi taqeta ku te da min
Xwe ji gunehan dawşand.

WÊ

Ew tiştê mezin
Weng hêsa
Weng hêsa got ku
Ez mat bûm
Min çakête xwe li xwe kir
Sal li paş xwe bi cî hiştin
Û derketim derve.

XAÎN

Wê li tebiatê xaînî nekir
Di wextê xwe da
Wek av çing di sed dereceyî da dikele
Ew jî keliya.

Sefoyê Asê

„ KÎ HÊLÎNÊ ÇÊDIKE?“

Hecî sibê zû pir bi kêf şiyar bû. Xwe di nav nivînan da bir û anî, paşê jî destên xwe kir bin serî xwe û li doh fikirî. Doh ji bo wî pir girîng bû. Ewî doh êvarê li gundekî cîran li dawetekê bû. Keçika di govendê da dîtî, qet ji bîra wî nedîçû. Navê wê hertim dianî bîra xwe û fikra wî li wê bû.

Hecî nêzikî bist û pênc salî bû, di emrê xwe da qet veng nebûbû. Hetanî wê rojê bi sedan keçên rind dîtîbû, lê keçika doh êvarê sewa wî tişteke din bû.

Salên wê bist hebûn an jî tunebûn. Yeka; bejn zirav û navtenik, porên wê yên reş û dirêj kirî bû du gulî û herdu gulî jî li ser singê xwe da berdabûn. Di govendê da mîna hîve dibiriqî. Gava ew bikenîya, te yê bigota li ser sercêvên wê da kulîlkên biharê vedikirin. Yên ku ew didîtin, lêve xwe gez dikirin û heşên wan li serê wan diçûn. Dil û çavên xortên gund li wê bû.

Gava ku Hecî ew dît, ar û alafak li canê wî belav bû û mîna ku biroşek ava germ li ser wî da bê rîjandin. Junî di binda sist bûn û taqet li canê wî da ne ma, dilê wî mîna dohleki dikir kuta kut.

Hecî bistkê bi şûva ji nav nivînan derket, kincê xwe li xwe kir û çû derva. Li derva dayîka xwe Zex dît. Zexê du-sê deqqa bi şûva ew ferq kir, bi lezekê berve wî hat û jê pirskir: “Hecî ez qurban çi bû ye, tu çima veng zû şiyar bû yî, an tu nexwaşî?” Hecî kenîya û bersîv da: “Na, na... Meraq meke! Ez ne

nexwaşim, xewa min nehat û sewa wê ez zû şiyar bûm.” Zexê bi wan gotinên wî bawer nekir û got: “Na, na... tişteki te yi heye halo çi ye? Dinê bişewite tu dîsa jî veng zû şiyar nabî.” Li ser vê gotina Zexê, Hecî qet tu şor nekir û serê xwe kir ber xwe. Dayîka wî êdî di derdê wî anî derê û got: “De bêje ew keça bi bext kî ye?” Hecî êdî ji dayîka xwe ra kat kir û got: “Keça Hûsên Axê ye. Navê wê jî Xatûn e.” Zex bi vê xeberê ve pir şa bû û bi eşqekê got: “Tu qet metirse, wê bibe. Tu dilê xwe qet teng meke. Keça Hûsên Axa layîqa mala me ye û him jî Hûsên Axa hevalê bavê te yê eskerîyê ye. Ma ew dîn bû ye, ku wê keça xwe nede lawê Camo Axa a bi tenê.”

Bîstkê bi şûva Zexê ev xebera ji mêrê xwe ra kat kir. Camo Axa bi vê xeberê pir şa bû mîna ku pê firî û got: “Ev dinê çi dîneyeke ecêb e. Kê şik dibir rojeke were û ezê herme keça Hûsên ji lawê xwe ra bixwazim. Wexta em ji eskerîyê vegeşîyan, tu zarokê min tune bûn û Hûsên jî hîn nezewicî bû. Îro jî zarokên me mezin bûne û dil girtin e. Hey gidî dinê hey.”

Camo Axa nêzikî şêst salî bû. Ew yekî pir dewlemend bû. Pênc kerî pez, pir erd, mal û milkên wî hebûn. Bi dehan xûlam li ber derîyê wî dişuxlin. Hinan jê ra şivanî, cotkarî û hinan jî karên malê dikirin.

Hecî lawê Camo Axa a bi tenê bû û serbixwe mezin bûbû. Sewa vê jî

xwastinekî wî tu caran ne dibû dudu.

Du-sê roja bi şûva Camo Axa, jina wî, çend malmezin û rûsipîyên gund berê xwe dane mala Hûsên Axa çûn xwezginîyê. Hûsên Axa bergunda wana hat û xêrhatin li wan kir, yek bi yek dil û xatirê wan pirsî. Paşê jî berva malê çûn. Piştî xwarin û vexwarinê gor edetên xwezginîyê, bi emrê Xwedê qewla pêxember va Xatûn ji Hûsên Axa, sewa Hecî xwestin. Hûsên Axa jî vê razî bû. Qelin wîqasî giraniya Xatûnê zêr li hevdû hatin û şor birîn. Piştî çend rojan bi şûva, mala Camo Axa destbi dewatê kir. Çel roj û çel şev li ber mala Camo Axa dohl û zûrna lêket. Xwarin û vexwarin dehat. Çel roj bi şûva Xatûn suwar kirin û anîn mala Camo Axa. Ji nawbera suwar kirina Xatûnê da pênc-şeş meh derbas bûbûn, Hecî û Xatûn pir bi dil bûn. Te ê bigota yek Mem e, yek jî Zîn e.

Dem hat Xatûn ducan bû û dergûşek anî. Lê dergûşa wê mirî hat dinê. Mirina dergûşê li malbata wan pir qar hat. Wana seva dergûşê mîna xortekî bîst salî şin dikirin, Xatûnê reş girê didan. Dayîka Hecî Zex bi mirina dergûşê va pir diêşîya, lê wê ev êşa xwe pir eşkere nedikir, hertim bûka xwe awnî dikir û digot: “Ez qurban tu dîn bû yî, çima wîqas berxwe dikevî? Hin hûnî ciwan in, bi îzna xwedê hîn pir dergûşên we wê bibin.” Paşê wê jî nedikarî bû hêstirkên xwe bigire. Bi girî gotina xwe berdewam kir: “Da çi biknî ez qurban, xwedê ûmrê dergûşa te jî, mîna Ose min qut birî ye. Min jî pey mirina Osê xwe mina te dikir, ka min çi awil kir, te yê çi awila bikî?”

Wexta lawê Zexê Os mir ewî bîst

salî bû. Ew mezinê Hecî bû û bi keça Ehmed Axê ra dergîstî bû. Ew rojekê bi xortên gund va cîrît didilîstin. Li meydana cîrîtê ji hespa xwe dikeve û hesp pela singa wî tena û wî dikuje. Piştî mirina wî dû mehan şuva dergîstîya wî dane yekî Tirk. Roja Os mirî Hecî jî li meydana cîrîtê bû û wî bi serbilindî listika wî sêr dikir. Gava Os ji hespê xwe ket, ew bi lezekê ber ve wî meşîya û dît ku ji dev û bêvilê Osê ra xwîn dirêje. Şaş bûbû ku çibike, wir da û wê da meşî, paşê jî heş li serî çûn û bîrva çû.

Ser mirina Osê ra nêzikî diwazdeh sal derbas bûn. Lê hîn sehneya mirina Osê ji bîra Hecî naçe. Ev sehna pir şevan dikeve xewna wî û ew bi qîrînî ji xewa xwe şiyar dibe. Sewa vê jî, wî pir dixwast ku lawekî xwe bibe û navê wî lêbike. Xwe bi xwe tim digot: “Hetanî lawekî min nebe û ez navê Osê lawê xwe nekim, ev xewnan tu caran ji berserê min naçin.” Lê çi bike Xatûnê cara duwemîn jî dergûşa xwe mirî anî dinê. Êdî wana nedizanî bûn ku çi bikin. Dilê wan bi hevdu dişewitî. Hecî pir berxwe diket û cixara wî a vêketî dibû heste ji bo ya din. Xatûn jî ji bo dergûşên xwe hertim digîrîya û dilorand. Destê xwe ber ve xwedê vedikir û digot: “Çima min çuçika te ruçikandî bû, ku te ev agira berda dilê min.” Dema ev gotinan ji dêv derdiket, hêstirkên wê mina çemekî şên diherikîn.

Wextekê şûva Camo Axa sewa derdê bûka xwe, ji çar alîyan çi hekîm çi xoce û sêhirdan hene ji giştka ra xeber şand. Pir neçû hekîm, xoce û sêhirdan yek bi yek diketin rê û dihatin mala Camo Axa. Herkî derman, nûsqa û

sehirên cûda cûda dinivîsandin. Camo Axa ji giştka ra qurban serjê dikir û serda jî pir pere dida wan.

Ji nawberê da wextake dirêj derbas bû, dermanên hekîma, nûsqayên xoceyan û sehirên sehîrdanan tu awil nekirin. Xatûnê dergûşa xwe ya sêyemin û çaremîn jî mirî anî dinê. Waxta Xatûnê wê dergûşa çaremin bianîya, gundî li ber mala Camo Axa civîya bûn. Te ê bigota li ber mala Camo Axa mahşerî heye. Hin jinên gund bawerîya xwe dianîn, ku Xatûn wê vê carê xwedan dergûşeke jîndar bibe. Li gor bawerîya wan Camo Axa xoceyên pir zane ji bo bûka xwe ji welatên dûr anîbû. Lê hin kesan jî bawerî nedianîn ku ewê dargûşa xwe bi jîndarî bine dinê. Demeke dirêj nekete navberê, ku dengê girîyên jinên malê, xwe gihande ezmanan. Û jinên ku li ber malê civîya bûn, wana jî êdî hêstirk di çevên xwe da negirtin û digotin: “Wax, wax... Mala mînê, gune le, tuh ev dergûşa jî mirî anî dinê. Êdî Hecî wê hewîyekê bine ser Xatûna bêbext.”

Ev gotina jinên gund salekê bi şuva rast derket. Rojekê malmezînen qebîlê û rûsipîyên gund li mala Camo Axa civîyan û bang Hecî kirin. Kesî nedizani bû ku, wê çi bibêjin. Giştik wexteke dirêj bêdeng man. Paşê Camo Axa dest bi şora xwe kir û got: “Lawê min ez jî dizanîm, ew gotinên ku ezê niha ji te ra bibêjim dibe ku dilê te teng bike. Lê çi bikim, tu lawê min î, ez jî sewa wê herdem rindî û şa bûna te dixwazim.” Camo Axa bîstekê bêdeng ma li çavên Hecî mez dikir. Paşê şora xwe bi dengê dilşewat berdewam kir û got: “Bûka me Xatûn, nezîkî neh sal in li

mala me ye, Xwedê bi ser me ra ye, me qet tu nerindî û xerewî ji wê nedîtî ye. Wê şoreke me tu caran nekir dudu. Lê çi biknî xwedê tu zarok nekirin nesîba wê. Sewa wê jî xwastina me ji te ev e, ku tu diwê ji bo zarokan dîsa bizewicî.” Bi vê gotina Camo Axa va, Hecî nişkava vecinîkî. Bîstekê qet tu şor nekirin. Nedizani bû ku çi bike û bibêje. Wî jina xwe pir ji hezdikir û nedixwast carekê din bizewicê û hêwîyê bine ser wê. Ewî neh salên ku bi Xatûnê va derbas kiri bû, mîna şerida filmekî ji ber çaven xwe ra derbas kir. Demekê bi şuva serê xwe heyna û yek bi yek ew kesên ku li odê da rûniştî mez kir û bi hêrs got: “Veng dilkevir mabin. Ez ê çawa careke din bizewicim, Xwedê carekê stûyê Xatûnê xwar kirî ye, niha carekê jî ez stûyê wê xwar bikim? Ci bibe bila bibe ez hewîyekê ninim sêr Xatûnê.” Pey vê gotinê kesên ku li odê rûniştî bûn, sewa Hecî îqna bikin yek bi yek şor heyman deng kirin. Wextakî bi şuva Hecî xwastina wan neçar qabul kir û got: “Lê şertekê min heye. Hûn vê şertê min kîngê qabul bikin ezê hîngê bizewicim.” Cimeatê bi meraqakî guhdarîya wî dikirin. Hecî şora xwe berdewam kir, got: “Vê rind bizanîn ku ez tu caran bi keça axa û began ra nazewicim. Jina ku hûnê ji min ra binîn diwê keçeke xizan û xulamekî be.” Li pey vê gotinê her kesek mat û metel man. Camo Axa bi vê gotinê dîn bû û bi dengêkî bi hêrs got: “Çi...te got çi? Lo te heşê xwe windakirî ye, an guhê min baş nabhîzin. Halo dîsa bêje te got ez çi dixwazim?” Hecî gotina xwe dubare kir. Li pey vê gotinê benz û bend

li Camo Axa miçiqî. Wî bi dengekî kelgirî û bilind got: “ Wax, wax, waxlo çima tu nabêjî ezî dîn bû me, tu vê şorê dikî. Lo te li kî derê dîyê ku lavê axayakî bi keçeke xulamekî va bizewice? Ez ê rabim zimanê te ji kokva bibirim. Bicehime here ji wir.”

Yên rûniştî vê carê ji sewa ku Camo Axa îqna bikin yek bi yek deng kirin. Wextekê bi şuva Camo Axa jî îqna bû. Li ser keça şivanê mala Misto Axa li Zewê qîrar dan. Çend rojan bi şuva Zew bê dawet û şayî bû bûk û hate mala Camo Axa, bû jina Hecî a duwemîn. Zew keçaka bîst salî bû. Ewî nêzikî yanzdeh salan ji Hecî piçûktûr bû. Sewa ku ew keça şivanakîye li mala Camo Axa kesî ew bi tişt nedihesiband, qedir û qîmet ne didanê. Xatûn şaş dibû ku çi nerindî û hesûdî li wê bike û herdem jê ra digot: “Keça şivên şûna xwe bizane, tu keça şivanekî yî, ez jî keça Hûsên Axa me. Ji bo vê jî tu ne hewîya min î. Tu sewa zaroka hatî vê malê, vê qet ji bîr meke.”

Di navberê ra çend meh derbas bûn, ku Zew bi ducana ket û keçek anî dinê. Nawê wê ji kirin Bêrivan. Bêrivan bi sax û silemat hate dinê bi şûva sê roj û sê şeva li ber mala wan dohl û zurne lekêt. Êdî qedir û qimeta Zewê li mala wan bilind bû, kesî gotineka wê nedikir dudu. Xatûn bi vê rewşê ra radîgerî, êdî tu qimeta wê ji nema bû. Hecî jî mîna berê nedîçû ba wê nedihat. Heftêkî şeş roj li ba Zewê bû, şevekê jî li ba Xatûnê bû.

Şevekê Hecî li ba Xatûnê bû. Bêrivan jî êdî yek salî bû. Devdeve nimê sibê qirîniyek bi ser Bêrivanê ket. Kesên ku li mala Camo Axa bûn, giştik

şiyar bûn. Bistkê dawestîyan ku Zew rabe û keça xwe awnî bike. Lê her çû girîyê wê zêde dibû. Deh-panzdeh deqqa bi şûva giştik rabûn û çûn oda wan. Zexê dît ku di nav nivînan da, dev û bêvilên Zewê tijî kef kof bûbûn. Tiştên nebaş ani bîra xwe û tirsek ket nav dilê wê. Bi lezekê berve wê çû, cîrafek ketî bû çokên wê û tirsîya. Hat û ber serê wê dawestîya, benz û beta wê miçiqî û bi zorekê ev gotinan ji dêv derket: “Zewê, Zewê ez qurban rabe, çi bûye, çi li te hatîye.” Zexê li xwe guman anî ku ew mirîye. Bi rûye xwe ket û dest bi şînê kir. Bistkê bi şuva cîran û mermalîyên wan hatin mala wan. Mêran Hecî, jînan Zex û Xatûnê jî Bêrivan ji odê derxist.

Ji ser mirîna Zewê ra nêzikî bîst sal derbas bûbûn. Hîn sira mirina wê eşkera ne bûbû. Ji mirina wê bi şûva, Hecî carekê din nezewicî bû. Bêrivan jî êdî bîstûyek salî bû. Û bi rindîya xwe liçar alîyan bi nav û deng bû. Dilê xortên gund li wê bû.

Bêrivanê pir ji Xatûnê hezdkir ew mîna dayîka xwe heq qeblu dikir. Ji ber ku wê ew mezin kirî bû. Sewa ku lawê Hecî tune bûn, wî Berivan mîna lawikekî mezinkir. Ew li hespê siwar tebû, tewa xorta cîrît dilîst, li deşt û çiyayên neçirvanî dikir. Wê tu caran destê xwe bi tu karê jina nedikir. Xortên ku dil bardabûn wê, nediwêrîyan dilê xwe ji wê ra eşkere bikin. Hecî xwazgincîyên wê li rê vedigerand.

Rojekê Bêrivan ji neçirê vegeşîya û hate mal. Ji bo bihna xwe hilde li ber derîyê aşxanê dawestîya. Ji hûndir dengê Xatûnê û kevanîya malê Fatê dihat. Fatê bi Xatûnê ra digot: “Nêzikî

deh rojan e xew qet nakeve çavên min.” Xatûnê bi qirf pirsdikir û digot: “Çima, dîsa dilê te mêrakî dixwaze?” Li ser vê gotinê Fat hiq hiq dikenîya û bi devken bersîv dida û digot: “Dîsa Zewê dikeve xewna min û tim bi girî pirsdike: `We çima ez kuştim?`” Xatûnê cardin kenîya û digot: “Tiştêk na be. Waxta diçî malê, bi xwe ra hindik qatix, ard û savar bibe, ew êdî nakeve xewna te.” Fat bi vê gotinê pir şa bû û bi yarenî digot: “Walla te li min izik kirin Xatûn. Ka te digot: `waxta em Zewê bikujin, bi şûva ezê te bi Hecî dim û Bêrîvanê jî ji min ra.` Tu nuha jî dixwazî şuna Hecî, hindik qatix û ard didî min.”

Gava ku Bêrîvanê ew gotinan bihîstin, mîna ku guleyek li dilê wê ket, aveka sor bi junîyên wê da hat û dinê bi ser da xelî bû. Wê ji hêrsa nedizani çî bike, paşê bi hêrs kete hundirê aşxanê û bi dengêkî bilind, got: “Min gotinê we giştik bihîstin, we dayîka min kuştîye. Ez ji we ra dizanim...” Wexta Xatûnê û Fatê, Bêrîvan dîtî xûzi li her du miçiqî, Xatûnê bi zimanekî lihevpiçikî got: “Ez qurban tu çî dibêjî, te gotinên me şaş fehm kir. Ma çima em dayîka te bikujin? Ma tu dîn î?” Bêrîvanê bi dengêkî wêre wê ra got: “Min bi rastî bihîstin...” Li pey vê şora xwe, wê çevên xwe di aşxanê da li xencerêkê gerand, Xatûn û Fatê fehm kirin ku ewê xerabîyekê li wan bike. Ji ber wê revîyan derva. Bêrîvanê xencerek dît, derkete derva û demekê li wan gerîya, lê ew bi zuva ji ber çevan winda bûbûn. Paşê li ser soka kanê rûnişt û têr girîya.

Bîstkê bi şûva Bêrîvanê bavê xwe Hecî dît. Bi lezekê berve wî meşîya

xwe û avête hemêza wî bi ser da girîya û got: “Bavo, bavo.... Xatûnê bi Fatê wa dayîka min kuştin e. Min bi guhê xwe va ew bihîstin, wana li aşxanê qala wê dikir min jî bihîst.” Ji wan gotinê Bêrîvanê bi şûva Hecî mat bû û dawestî, bi hêrs Bêrîvan azar kir û got: “Keçê te hişê xwe winda kirîye, tu fêdî nakî îftira li dayîka xwe diki? Here oda xwe, bila çavên min te nebîn in. Ji kesira ji qala wan derevên xwe meke.” Paşê lêxist çû. Bêrîvanê li pey wî bang kir û got: “Bavo, qurbana te me. Ez derewan nakim. Carekê guh bide min...”

Nawberê ra mehek, du meh derbasbûn. Êdî Xatûnê bi Bêrîvanê wa deng nedikirin. Bêrîvan li nima sibê ji mal derdiket, hetanî nivê şevê nedihat malê. Xatûn êdî şaş ma bû, ku çî hesûdî û nerindîyan li wê bike. Ew êdî bi rastî jinbav bû.

Rojakê Hecî û Xatûn di nav nivînan da bûn. Xatûnê mîna her şevî dîsa hesûdî û nerindî li Bêrîvanê kirin û got: “Bêrîvan çima sibê heta êvarê li deşt û çîyan digere? Tu nizanî ew êdî ne zarok e, ew êdî keçeke ber zewacê ye. Hemsalên wê giştik zewicîn û çun li ser malên xwe. Ew hîn mîna zarokan li der û deştan digere. Kî dizane, dibe ku wê dostek ji xwe ra dîtî ye û bi wî ra digere.” Ev gotina miruzê Hecî tahl bû û bi hêrs got: “Tu çî dibêjî Xatûn, tu nizanî Bêrîvana min mîna mêran e, ew bênamusîyeke veng nake.” Xatûn di ber xwe da kenî û bi qirf got: “Jin kîngê va bûne mêr Hecî Axa? Vê êdî rind bizane, Bêrîvan ne zarok e, ne ji mêr e. Ew keçeke bîst salî ye. Helbet dilê wê jî mêrekê wê bixwaze.” Li ser

vê gotinê Hecî serê xwe kire ber xwe tu şor nekirin. Xatûnê gotinên xwe bi kêf berdewam kir û got: “Him carekê jî keçika xwe bipirse, halo ew jîn e an mêr e?”

Gotinên Xatûnê tirsek xist dilê Hecî. Wî dixwast ku bi gotinên Xatûnê guman be. Halo gotinên wê rastin an na. Rojekê wî bangî Bêrîvanê kir û jê pirsî: “Keça min pîrseka min ji te heye. Ez bersîva te pir meraq dikim.” Bêrîvanê bi meraqekî guh dida bavê xwe. Hecî jê pirs kir û got: “**Hêlînê kî çêdikê, jîn an mêr?**” Bêrîvanê demekê fikirî, paşê ji xwe guman bersîv da û got: “Helbet hêlînê jin çêdikin. Mêr bi tenê tişteki bi şanakin. Jin heye mirov dike wezîr, jin heye mirov dike rezîl.” Ji wan gotinan bi şûva şewqa çavên Hecî vemirî, pozê xwe yî dirêj qercîmand û bi dengê bilind got: “min tu mîna mêran mezin kir î, gerê ev gotinan ne gotinên te bûna. Hema ew gotinên Xatûnê giştik jî rastin, tu bênamusîyê dikî.” Paşê bi hêrs di çengê wê da girt û ew berve odê kişand. Ew avete hundirê odê û derî jî li ser wê da girt. Bistke bi şûva Xatûn kete hundirê odê ji Hecî pîrskir û got: “Çi bû, keça te got çî?” Hecî serî xwe kire ber xwe û bi dilekî nerazî got: “Gotinê te giştik rast in...” Xatûn bi vê şorê pir şa bû û got: “Ji bo tewa çî? Ez bi mirina xwe tenê nizanim. Tu yê niha çî biki?” Hecî bi dengê bêsavt got: “Nizanim”

Ji nawberê ra çend meh derbas bûn. Bêrîvanê ne fikrên xwe diguhurî, ne jî ji oda xwe derdiket.

Rojekê Hecî bi Xatûnê wa siwar bûn û çûn gundekî ciran sewa ajcîtiyê. Xatûn sewa ku nimê nivro bike çû

maleka gund. Wê nimê xwe xelaskir û şûva derkete derwa li dor aliyê xwe sêr kir, dît ku xortekî li sîya darekî da rûnişti rû û simêlên xwe yî tevlihev bûna şerebê vedixwê. Xatûn çerxe xwedîye malê: Besê bû bi meraqakî ji pîrskir û got: “Wa xortê kî ye? Malka mîne...” Besê fedî kir ji fediya xwe ra serê xwe kira ber xwe çet tu şor nekirin. Xatûnê êdî fehm kir, ku ew lawê Besê ye. Lê dîsa jî xwast rind bizane ku ew lawê wê ye an na. Dîsa jî jê pirsî: “Çima deng nakî, ew lawikê te ye?” Besê hîn serî li berda bû, bersîv da û got: erê ew lawikê min e. Xwedê stûyê wî bişkêne û min ji destê wî xilas bike.” Paşê bîst-kê dawestîya hal û heqat lawê xwe ji Xatûnê ra got. “Ew îro bist û pênc salî ye. Hemsalên wî giştik zewicîn û bûn xwedanê zar û zêçan û mala xwe xwedî dikin. Lê ew jî, sibê heta êvarê di bin sîya darê da rûdinê û şeravê vedixwe. Destên xwe nade tû karî. Ez vê saletîya xwe da, ji gûndîyan ra nê lêdixim e û mala xwe xwedî dikim e.” Xatûn bi van gotinan pir kêfxweş dibû û li ser soka nê rûnişt û bi meraq gûhdida Besê. Besê jî hin şora xwe berdewam dikir. “navê lawê min Hesen e. Ew zarokê min î tenê ye. Mêrê min nêzikî çar salan ber wê, ji nexaşîya dil çû li ber rehma Xwedê. Hesen zarokê me yê tenê bû, sewa wê jî me tu caran nedihîşt ku destên wî karekê bibe. Ew jî veng mezin bû û hertim xwe ji kar dilsar kir. Xwe ne da tu ber karî. Erdê ku ji bavê ma bû, ew jî di destê apê wî da ne. Jîyana wî da wê gavê tenê di bin sîya daran da şerav vexwarinê va derbas dibe.” Demekê şûva herdû jî rabûn û berê xwe dana mala şînê.

Devdevê êvarê Hecî û Xatûn ve-gerîyan gundê xwe. Xatûnê li mal ji Hecî ra qala Hesên kir û got: "ez kîngê va ji Berîvanê ra mêreke veng digirim. Bila Berîvan wî xortî bîne rê, emê hîngê bibînin hêlînê kî çêdike? Hecî van gotinan bêçare ev pêşnîyara qebûl kir û got: "Sibê ji malbata wî ra xeberê bîşînin ji bo xwestinê bila warin." Wê şevê ji eşqê xew nekete çevên Xatûnê. Xatûnê seva xeber dayîne, dora dina rojê merîyek şande pey malbata Hesen. Du roja şuva malmezînen wan hatin û Bêrîvan ji Hesen ra xwestin.

Xebera dayîna Berîvanê mina di rojekî da herçar alîyê heremê belav bû. Yên ku ev xebera dibihîstin şaş û metel dibûn. Mîna ku tewên xort bi vê xeberê radigerîn û dibheciyan. Digotin "dinê tê guhertin. Bi hezaran xortên mêrxas dilberdabûn wê û Hecî ew da yekî serxweş û bêkar." Hinan jî digot: "bextê wê hêbûya dayika xwe veng zu nedimîrîya û ew veng stûxwar nedihîşt."

Hefteyekê şuva Berîvan sîyar kirin. Li ser sîyar kirina wê ra êdî çar meh derbas bûbû. Bi rîndî û jêhatîya xwe, Hesen bi xwe va girêda. Hesen di vê demê da xwe ji şeravê dûr xist û erd û zevîyê bavê xwe ji dest apê xwe girt. Dayika Hesen û gundî bi lê ecêp diman. Besê hertim lê dûa dikir û gundîyan jî digotin: "zîmanê xweş merê ji şûnê derdixe".

Navberê da heşt sal derbas bûn. Hecî êdî kal, xatûn jî pîr bûbû. Rojekê Xatûn nexwaş ket û êdî dizanîbû ku wexta mirin wê hatîye. Bangî Hecî kir û herdû di odê da tenê mabûn. Xatûnê keserek da xwe û paşê dengêkî bêsavt

dest bi şorê xwe kir û got: Hecî ez baş dizanim ku ew gotinên min î ezê niha ji te ra bibêjim wê dilê te teng bike. Lê çibikim min carekê bû. Xwastina min ev e ku sifte Xwedê, paşê jî tu û Berîvan hûn min ef bikin. Zev min bi Fatê va kuşt. Tu jî dizanî bû ku min jê heznedikir. Wexta wê Berîvan anî dinê, dinê li ser min da xelî, ez pir jê diqarîm. Yêk jî te bi dê û bavê xwe wa mîna berê qîmet neta min. Wa jî pir li min bi qar dihat. Ez pir ditirsîm eger Zew lawikekî jî bîna dinê hun ê min bişînin bavana. Sewa vê jî ez rojakê bi Fatê kenîm û min got: "Fatê tu jineka bî yî wera em Zewê bikuşî eza te bi Hecî dim. Berîvan ji min. Min wa zû îqna kir. Ew şeve tu li ba min ma bû Fatê axû kire xwarinê wê û ew kuşt. Ew rojê ku Berîvanê em bihistinî ma bi Fatê wa qala wê dikir. Berîvanê ew roje derew nedikir. Min ji wê rojê şuva hertim îftîra û hesudî li we kirin, te jî tim bi gura min dikir. Min hingê baş zanîbû ku jin hêlîna çedikin." Biskê herdu jî bédeng man. Xatûnê çevên xwe kirin çevên Hecî. Xwast ku hin tiştên din disa ji wî ra bibêje, waxta ku heşê Hecî hat serê wî, dit ku Xatûn êdî nedijîya. Çevên wê vekirî mabûn û Hecî bi destê xwe va çevên wê girtin. Wê demê tenê çend dilop hêsir ji sifetê wî ketin li ser singên wî..."

Piştî mirina Xatûnê, Hecî di mala xwe da tenê ma bû. Wî eslê meselê jî hevisî bû. Qirara xwe da here keça xwe ji destê Hesenê serxweş bigire û bine mala xwe. Çend roj bi şuva kete rê çû gundê Berîvan lê ye.

Li ber mala zavê xwe dawestîya û demêkê doralîyê xwe sêr kir. paşê dit

ku du zarok li ber mala Hesen bi hevra dilîzine û mêr û jinek jî di bostana li kêlaka malê da dişxuline. Bi dengegî nizm, banga zarokan kir. zarok hema hatin li ber wî dawestiyên. Ji wan pirsî û got: “hûn zarokên kê ne?” zarokê mezin hema bersîv da: “em zarokê Hesen in.” Hecî nişkava veciniqî û pirsek dîsa li wan kir: Hela ji min ra bibêjin navê we çî ye?” bersiva zarokan disa dereng ne ma: “navê min Os e û navê xwanga min jî Zew e.” Waxta Hecî ev navan ji zarokan bihîst, bihna wî deng bû û cirafek kete çokên wî. Hecî cevên Os û Zewê mêz kir û cardin pirsî: “Dîya we li ku ye.” Os pêçîya xwe va cihê bostîn li wî nîşan da. Kesî tişt ne-got û berve bostên rêketin.

Bêrîvan û mêrê wê li bostîn da dişuxîlîn. Osê bi dengê bilind bangî dê û bavê xwe kir. Berîvan û Hesen karên xwe berdan û berve derîyê bo-

stîn hatin. Berîvan nişkava dawestîya û bavê xwe nas kir. Bi naskirina wê va tenê şora bavo ji dêv derket. Piştî vê şorê Berîvan ket û bîrva çû. Demeke qut da hişê wê dîsa hate sêrî. Rabû û hevdû hemêz kirin û dirêj dirêj bi ser hev da girîyan.

Hesen hema meşîya gomê û beranek derxist ber ningên xezûrê xwe serjê kir. Paşê derbazî malê bûn. Cîran û pismamên wan yên ku hatina bavê Berîvanê dibihîstin yek bi yek dihatin malê. Waxta xwarin vexwarina wan xilas bû, Hecî ji Berîvanê ra qala mirina Xatûnê û kirinên wê kir. dora dinê rojê giştîk tevhev çûn gundê Hecî Axa. Hecî Axa wê demê şunda mal û milkê xwe ji keç û zavayê xwe ra hîşt. Hecî heta dawîya emrê xwe bi tev keç, zava û newîyên xwe jîyaneke bextewar jîya.



Hatti Sàrl

Pirtûkxana Kurdî - Tirkî

Lozan – Îsvîçre

Behram ALABAY

Adres:

Hatti Sàrl

C.P. 174

1000 LAUSANNE – SUISSE

Tel: 0041 216 24 46 39

Fax: 0041 216 24 46 40

Mobil: 0041 79 776 30 69

Not: Kitapçılık dışında, her türlü taşımacılık yapılır.

Hatti Sàrl Kürtçe-Türkçe Kitabevi Lozan – İsviçre

NAN Û EKMEK

Emê kurik wûnî, pênc-şeş salînî. Dilê min de, du tirse mezin hebûn. Yek, sala pêş ezî dest bi dibistanê bikime, ezî Tirkî nizanime, ezê çawa bikim? Yek jî, mezin bûm herime eskerê. Ji ber van herdu tirsana xewe mine şevan tune wûn. Du mamosteyên Tirk, bi Kurdî nizanin şandine gund. Ewana li dibistanê, kurikên gund hînî Tirkîyê dikine û didine xwandin. Destê şagir-tan, li quranê dixine û bi sondên mezin didine sonda, ku bi Kurdî deng nekin.

Xwedê jê razî be, hevalekî cîran hebû; Memo. Min û çend hevalên wek min ditirsîn, me jê re ew tirsana xwe kat-kir. Memo got: "Hûn netirsîn, Tirkî vîqasî hûn diwên ne bi qar e. Ez, Tirkî yê baş dizanim. Ezê vi ber we xim. "Memo, ji wê rokê de dest pê kir me hînî Tirkîyê bike.

Memo: "Rind mêze kin, peyvên Kurdî, ku hûn dizanin, paşîya wana, we "yam" pêva kir, a bibe Tirkî. Wek;

av=avyam,
nan=nanyam,
dest=destyam,
sêv=sêvyam"

Bi ser wê dersa siftê de em xenê bûnî. Hevalekî ji Memo re:

– "Wisayê xerê, ji malê Şixî Qînê re bi Tirkî dibên çî?"

– Memo: "Malê Şixî Qinyam"

– Heval: "Lê malê Hewê Qumê"

– Memo: "Malê Hewê Qumyam"

Memo ew tirsana ji dile me bi derxisti bû, êdî me jî Tirkî dizanî.

Dora dine salê, me dest bi dibistanê kir. Çi ji me re heyê? Emê, di saya Memo de, Tirkîyê giştikê dizaninî. Lê, roka siftê li dibistanê zimanê mamostan, qe ne mîna Tirkî ya ku Memo bi ber me xisti bû. Mamoste deng dikir, me qe tiştek fahm nedikir. Roj derbas dibûn, min mêze kir her hevalek bi zaravekî Tirkîyê deng dike. Lê, hêdî hêdî me Tirkî tenakê diêvisî. Dîsa jî, em ji nav bi dernetiketînî. Her yekî ji me, kerîyek şaşî û xelatî dikir. Rokê, mamosta em li ber dibistanê berhev kirin. Şîret li me dikirin:

– "Hûn hatin dibistanê, bira hûn paqij bin, xwe qilêr mekin, defter û pênuşên hev û du medizin, neşkênin ona göre"

Va dengkirina, wek tê zanîn bi Tirkî bû. Min, hen ji wana fahm kirin. Lê, "ona göre" çî bû? Ez çûm cem Memo, ez jê pirsîm. Got:

– "Magî tu, vê jî nizanî? Mamoste dibê 'Herin gorene xwe yên ecer bikirin' "

Bi ser wê wergerê Memo de, ez çûm li mal girîm. Min, gorene ecer xwastin. Lê, li gund gorê ecer li kêderê biwîni? Girîyê min, ji min re ma.

Wê wextê, nan û xwarina mamoste, mîna cîriya şivana her rokê dor bi dor malekê dida ye. Rokê, hevalekî tebaxa xwarinê di dest de, kete hewşa dibi-

stanê. Mamoste dît nanê wî tînê, ji heval re got:

– "Ne getirdin?" Heval jî:

– "Göşt"

Vî jî, rêke xwe dîti bû. "Goştê" bi Kurdî, du nixtukê xwe kiribûn ser "o" yê vergerandi bû Tirkîyê.

Mamostan, dev ji me bernedidan. Em jî, ji şaşî û xelatîya xilas nedibûnî. Ji me re digotin; "bez getirin". Em diçûnî mal, li şûna paça li bezê dûyî pêz digerinî. Dîsa rokê, di dersxanê de mamoste, hevaleyê rakir got:– "git yengenden bana bir sigara al, getir." Heval çû û hat, cixarek da mamoste. Lê, ew cixara tûtîn wû, cixara mamoste Bafra bû. Hevalê fikare, fehm kiribû mamoste cixarekê dixwazê. Lê, nedizanî "yenge" çi yê? Bi xwe û xwe fikirî yê, di serê xwe de gotiyê; "biwe biwe mamoste dizane, Apê min cixare vedixwe." dihere ji Apê xwe tûtinekê dixwaze, tîne ji mamoste re.

Mamoste yên me, hetanî me hînî Tirkîyê bikin, em bê ziman kiri wûn. Kurdî ya me dizanî, ji me re qedexe wû. Tirkî jî, ne me dizanî, ne jî dayîkên me. Em birçî diwûnî, diçin li mal rûdiniştinî me deng nedikir. An jî dayîka min, xwarineke ez jê heznakim dida min, min ne dizanî ez bêjim ez wêye naxwim. Min tenê digot "qozî", paşi tûne wû. Me di kurikîya xwe de, têrî xwe vî dayîkên xwe re ne got "etê"!..

Emê, di sinifa çaran de wûni. Bi ber me xistibûn, bedena meriya ç perçe wûn; seri, laş, mil û pê (baş, gövde, kol ve bacaklar). Ji hevalên me Miho, zikê xwe diêşî, ji ber êşê ne dihewî. Dayîka xwe jê pirsî "kêdere te dieşê?" Miho:

– "gövdem arıyor". Miho; zik ne dizanî bi Tirkî çi yê? Zik jî, dikete nav laşê vî. Miho jî, ew bi "gövde" bi nav kir.

Li gund, havalên bi van zor û zilmana dibistana yekemîn xilas dikirin-nedikirin, dev ji Tirkî berdidan. Bi şûva, bi Kurdî deng dikirin. Memo yê meyî devje, dibistan xilas kir jî dev ji Tirkîyê berneda. Ji xagîya, bi Tirkî deng dikir. Li gundê me jî, hevalên li dibistanên bilind dixwandin jî, ku li gund bi Tirkî deng dikirin; bi wana qîrf dikirin û ewana rexne dikirin.

Memo yê me hetanî çû eskerê, li gund bi Tirkî deng dikir. Çû eskerê hat, ji xagîya re mîna ku xerman ji bîrkiriwûn; ji xermana re digot: "bu zûtikler ne?" Vexta, ku eskerîya xwe xilas kir hate gund, cîraneke vî dihere xêr hatinê lê bike. Jineke 55-60 salî ye. Ji Memo re dibê:

– "Memo qurban bi xêr hatî" Memo herdu ling ji bin xwe berdane, tizbî ya xwe di dest de geh virda geh wêda badikiriye. Ji xaltîyê re gotiye:

– "Kız Emîne sen hele yukarı geç"

Bavê Memo, ku ew hereketa vî dî; rahiştîyê şiva xwe, di tengile Memo re yek û du pê radikşîne.

– "Memo yî mino, tu ji mezina re veng hurmetîyê dikî? Yek jî bê; ka ji te bêtir, li gund kî bi Tirkî deng dikê?" Memo:

– "Erê bavo, welle kirîk ku ez bi xwe jî, vî zimanî berdim. Vana yê vî nêre dibêne ekmek".



BI GURBET UZUNEL RE HEVPEYVÎN "FITTJA WELATÊ MIN E"

Navê Gurbet ji kîderê tê?

– Navê min dapîra min danî. Wê bawer dikir ku ev nav li min tê. Ji ber ku ez zarakê malbatê yê pê'sîn bûm ku li dervayî welat hatibûm dinê. Dapîra min pi'stî ku dayika min koçberî Swêdê kiribû, gelek bîra wê kiribû. Li vî welatê teze gelek ti'st hebûn mirov nizanibû, vê yekê dapîra min gelek ditirsand. Piştî çend salan dapîra min hate serdanê li Swêdê ku derbarê rewşa me de agahdar be. Kêfa wê gelek ji dayika min re hat dema wê dît ku ew hê bi şalwara xwe ve digere.

Peyva Gurbet çend maneyên wê hene, wek xerîbî û hesret. Dema ez piçûk bûm bi rastî min nizanibû navê min ji kîderê tê. Dema hercar min xwe dida nasîn ji bo hemwelatîyên dê-bavê xwe, min mêze dikir ku reaksiyonên wan bi keder bûn. Gelek caran bi nêrînên jandar li min mêze dikirin û navê min gelek caran ji xwe re dubare dikirin. Menaya navê min gelek kûr bû, lê belê ji bo min tiştek îfade nedikir. Ji ber ku min nizanibû xerîbî û xerîbistan çi ye, ez li Swêdê hatibûm dinê.



Gurbet Uzunel di pêşengeha kurdî de, Fittja, Nîsan 2003



Malbata Gurbetê li Swêdê
(Keça ku di erebê de digirî Gurbet e)

Malbata te ji kîderê tê?

– Malbata min ji Tirkîyê tê. Ew li gundê Omera (Tavşançali) dimînin, ev gunda li Anatoliya Navîn e. Gundê Omera welatê dê û bavê min e. Gelek heval, pizmam û nasên wan li gund mane. Dê û bavê min hersal diçin Tirkîyê ku li Omera di mala xwe de bijîn. Ev yeka ji bo min hîseke cihê ye, ez tu car li wir demeke dirêj nemame, tenê du salan carê havînan diçime wir. Ez li mayîna wir hez dikim, ji bo ku

ez, gund û mirovên gund hez dikim. Dema mirov Swêdê û wir dide ber hev, bi rastî rewşa wir cihê ye.

Koka malbara te dighêje kîderê?

– Bavê min ji min re vegot ku koka malbata wî ji qeza bajarê Bitlîsê, Tatvanê tê. Bapîrê min û diya wî dora sala 1910'an li Anatoliya Navîn cîwar bûne. Bavê min, ap û du birayên min çend caran berî gelek salan çûne Tatvanê û serî dane pizmamên me. Hin pizmamên me ji Tatvanê bar kirin, çûne bajarê Îzmirê. Wê demê ez çûme Îzmirê, min ew ziyaret kirin. Vê gavê pêwendiyên me yên gelek bi tanzîm bi wan re hene.

Ji malbara te gelek li Swêdê xwendine, ev çawa dibe?

– Gelek dijwar e mirov vê yekê bi fakto-rekî ve girêbide. Bêşik alîkarî û cesarete-ke mezin dê û bavê me dane me. Yên mezin dest pê kirin, me da pey wan. Em di rêç û şopa hev de meşyan. Em heft xwişk û bira ne, çar bira û sê xwişk in. Birayên min wek sîyasetmendar (li belediya Botkyrkayê), hikuknas, molekulerbiolog (li Nexaşxana Unîversîteyê ya Hud-dingê) û wek emlakî kar dikin. Ez bi xwe socionom im, xwişka min ya piçûk hikuknas (beşa hikukê ya bajarê Stockholm de kar dike) û ya din teze lîse xelas kir, em nizanin ew ê bibe çî.

Tu xwe çawa dihesibînî?

– Pirseke gelek dijwar e. Ez bawer dikim gelek caran di hin rewşan de ez xwe zêdetir kurd dihesibînim, carina jî eksê vê. Ez nîv kurd û nîv swêdî me. Ez gelek dilşa me ku ez îmkana xweyê du çanda me. Ev yeka min dike keseke bi du-çand.

Du li Fittjayê dimîni. Fittja wek cîhekî hikmê kurdan lê zêde ye tê zanîn. Fittja ji bo te çi îfade dike?

– Fittja welatê min e. Dê û bavê min piştî sala 1975 heta niha li vir dijîn. Ez ji Fittjayê hez dikim. Lê belê ez zanim ku li vir problem hene. Problema giring zimanê swêdî y. Ez bawer dikim ku divê em bi swêdiyan re zêdetir bibin yek, entegre bibin. Ev yeka îro ji ber kêmbûna xaniyan li Stockholmê ewqas ne hêsa ye. Zarok jî giring in. Dê û bav divê zêdetir bi kirinên zarokan di dibistan û di demên wan yên vala de mijûl bibin. Bi rêya angajmanê mirov dikare tenê alikariya xwe nîşan bide.

Kurdên Anatoliya Navîn wê çawa li welatekî wek Swêdê zimanê xwe biparêzin?

Di warê parastina zimanê xwe de kurd gelek jêhatî ne. Ew zêdetir bi zarokên xwe ve kurdî deng dikin. Rêyeke baş ya parastina zimên berdewamkirina wî ye û ez bawer dikim ku kurdên Anatoliya Navîn vê yekê bi cîh tînin Wek tê zanîn zimanê kurdî gelek di bin bandura peyvên tirkî de maye. Ez bawer dikim divê cihê peyvên tirkî, em peyvên kurdî fêr bibin. Îro li Fittjayê qurseke zimanê kurdî ji bo jinên ku dixwazin zimanê kurdî binivîsin û bixwînin, heye. Ez bawer dikim ev yeka destpêkeke baş e ji bo dayikan.

Te bi kurdan re kar kiriye û ev yeka ji bo te çi îfade dike?

– Li belediya Botkyrkayê di dibistanekê de ez wek kurator kar dikim, zanîna zêde ziman û çandan îmkaneke mezin e. Li dibistanê gelek ciwanên ji welatên biyanî hene, lê belê ewqas zêde kurd tunin. Ciwan gelek kêfa wan tê dema

zanin ku ez jî yeke xerîb im. Ew baş fam dikin ku ez belkî ji yeke din zîdetir dikarim ji bo wan kar bikim. Gelek şagirt hatin bal min gotin ku em jî dixwazin bibin kurator û zehmetbûn û nezehmetbûna xwendina li unîversîtê ji min pirs kirin.

Tu di amadekirina pêşengeheke derbarê Kurdên Anatoliya Navîn de beşdar bûyî, derbarê vê xebatê de tu dikarî çi bêjî?

– Me derbarê Kurdên Anatoliya Navîn de pêşengehekê ve bahara çûyî amade kir. Bi vekirina vê pêşengehê, me xwast ku em nîşan bidin em xweyê çandeke giring û balkêş in. Ya yekemîn ez gelek tiştan fêr bûm, di nav komê de ez ya here ciwan bûm û ji endamên mayin yên ku gelek salan li welat mabûn gelek tişt hînbûm. Ez hêvî dikim ku projeyên waha di rojên pêş de zêde bibin. Ez fêr bûm ku gelek tiştên me yên nîşandinê û pê serbilindbûnê hene.

Di rojên pêş de tu dixwazî çi bikî?

– Ez cara pêşîn xebata xwe ya masterê dixwazim biqedînim. Ez ewqas zêde nefikirim wekî ez ê çi bikim. Rojên pêş wê ve yekê tayîn bikin.

Rojekê dixwazî herî Kurdistanê?

– Ev gelek sal in ez hêvî dikim, lê belê neçû sêrî. Li Tatvanê hê pizmamên min hene û ez hêvî dikim ku rojekê herim wir û wan li wir ziyaret bikim.



DİLÊN ŞIKESTÎ

Wexta xermana wû. Danê êvarê, Çeko bi tenê di odê da, berî berve pencerê rûniştibû. Bi çavên mat yên ku fer têda nemabû, li derva mês dikir. Mala wî li dawîya malan bû. Ji wê wêda xanî tûnebûn. Di pencerê ra, mexelê pezê wi û ji mêxel wêda şûna xermanê wi jê va xuya dikir. Dem û dewranên berê di bîra wira derbas dibûn. Mexelê kerîyê wi yê pêz niha bêtal û xewle bû. Şûna hespên wî yê kûmêt motir û makînen zevîya girtibûn. Ji dûrê da, ji axzê xermanan da dengê makînen sap hêrdinê, ku jê ra patoz digotin, dihat. Wana sapê sipî dihêrdin. Toz û dûman ji ser wan heldihat.

"Tawo, çi dînêke derewin e, lawo!" Çeko di ber xwe da got û pê ra kesereke kûr kişand. Çavên xwe li ser mexelê pêz û şûna xermanan gerandin. Ew li tiştên wendabûyî digerî. Di van salên dawîyê da, pîrr tişt hatibû gûhêrtinê. Ew gûhêrtin bi wi ne bixweşî bûn. Wî nedixast pêz û hespan bifroşe, şûna wana motir û makînen zevîya bistîne. Lê wî bi Jina xwe û lawên xwe nikanîbû. Jina wî, Sultana Silê û lawê wî yê mezin bi a xwe kirin, bi zorê hesp û pez firotin, şûna wana motir û makîne zevîya sitandin. Ji ber ku Çeko kal bûwû, wana êdî bi gora wî nedikirin. Va jî li Çeko pîrr bi qahr dihat, wî pê zikê xwe diêşand. Wî ê ji paşê da bigotat, "Wextê ku pez û hesp ji dest min

çûn, hîngê text û tacê min wergerî; şora min êdî pere nedikir."

Cihêbûna lawê wî yê mezin, Hesen jî li wî pîrr bi qahr hatiwû. Hesen bi gora bavê xwe nekiribû û cihê bûbû. Heta wî li ber bavê destê xwe helnabû; ew bi hing û hewlî cihê bûbû. Çeko bi vê pîrr êşiyabû, li Hesen sûva hat, çar sala neçû mala wî. Di wexta xwe da, Çeko merivekî li ser xwe bû. Ew serdarê mala xwe bû. Wexta kû ferman dida, tu kesi li ber nedigot, hiq jî. Ewî pîrr jîr û bi xîret bû. Ji heqê her karî di hate derê. Kerîyek pezê wî yê bi şîr hewû, mîna çira çavê xwe lê mês dikir. Dusedpence deqer herd ji bavê da jê ra mabû. Bi cotek hesp rençberîyêke bi şohret û bê misal dikir, yên derdora wi bi çêrê bûn.

Ew teve qelawên (dewlemend) gund dihata hêjmartin. Wî zemanî qelaw nedişûxlîn. Wana şûxilîn bi eyb digirtin, ew wekî karê xizan û nezanan qebul dikirin. Lê Çeko ne mîna wana bû, ew mîna xizana dişûxûlî. Wexta digotin, "Çeko î qelaw e", wî hema lê vedigerand digot, "Na na, ez ne î qelaw, ne jî xizan im; ez qelawekî xizan im!"

Ew dewrana rabirt çû. Niha Çeko ketibû halekî xeraw. Sala dabû dû salan, dewran gûhêrî bû. Çeko bûwû kalekî û mîna ku tê gotinê, ketibû ber destan û benda mirinîyê dipa. Jina wî,

çend sala berî vê, dînîya xwe gûherîbû. Lawên wî yên mezin cihê bûbûn. Keçên wî jî mêr kiriwûn û bûwûn xwedîyê zar û zêcan. Ew li cem lawê xwe ê piçûk, Miço û jina wî, Zênewê dima. Zênewê xizmete wî dikir, lê ne mîna berê. Wê carcaran dest li ber xezûre xwe girênedida û ji ber wî ranediwû. Berê pişta xwe di wî aldikir şîv dixwar, niha berve wî dixwar. Wexta ku girêka kefiya wê vedibû, wê mîna berê bi lez ew girênedida.

Ji hêlekê da, dilê Zênewê bi Çeko dişewitî; gunê wê pê dihat. Wê xwe bi xwe ra digot, "Gune ye, xêrek e, sewabek e", xizmete wî dikir. Heta, carcaran, wexta Çeko nexweş diket, wê ew li xwe dina dibire abdestxanê. Lê wext dibû, dilê wê qet nedixwast ji wî ra bê qusur hizmet û hurmet bike. "Va çima nemir ku em jê xelas bibin!" Wê di ber xwe da digot.

Zênew bi lawê meta xwe va zewicîbû. Zewaca wê bi Miço va, ne bi dilê Çeko bû. Ew li dijî zewaca wana derketibû, lê tu avil nekiribû. Jina wî, meta Zênewê, Sultanê bi a xwe kiri bû, Zênew li Miço mar kiribû. Çeko ji neçarî pê razi bûbû. Zênewê va dizanî û ji bîr nekiribû. Wê zikê xwe pîr pê êşandibû. Wexta di hate bîrê, ew li Çeko pîr diqehrî. Lê çî bike, erf û edeta rê nedidan ku ew vê bide rûyê wî û a dilê xwe da jê ra bibê. şûna vê, wê niha, bi zanetî an nezanetî, di xizmet û hurmeta ji wî ra da, qusur dikirin û tê bigota, ewê bi vê rê heyfa ji wî heldinê.

Qusurên wê yên li gora edetên hîngê, li Çeko bi qehr dihatin. Lê wî jî nediwêrî ku eşkere Zênewê azar bike.

Ew muhtace wê bû; ji wê ra bi midare wû. Carcaran, di ber xwe da digot, "Ne fedî, ne heya maye!" Lê wexta Zênewê xizmete wî dikir, mesela ew dibire abdestxanê, "keçika min, xwedê ji te razî be, tu qet tu talîya nebîn!" Wexta ku newîyên wî yê piçûk dihatin ser wî, li ser jûnîyê wî rûdiniştin û maçek didane wî û jê pere dixwastin, ew pê xenê diwû, fer diketê çavên wî. Lê bi giranî, ew ji jîyanê eciz bûbû, dixwast ku rojekê pêş da, ji vê dîne barke here. Wexta ku nexweş diwû û xemên tenebûnê xwe lê dipêçandin, ew bi ber xwe diket, kelgirî diwû, serîyê xwe û destê xwe yê rastê berjor heldina, bange xwedê dikir digot, "De bes e êdî, î gihanê bişîne! Na, naşînî, hîn hesawên min ên vekirî hene, ne!" Qesta wî ji î gihanê, ezrayîl bû. Wê rojê Miço î li xermana bû. Zênew li pêş malê, li ser çogan rûniştîbû. Wê di zerikekê da dû girçik bi şûjîya serçîna nerm kiribû dida ber çêlên culiqan. Zênewê wekî hemsalên xwe zû va bû ku xeftan êxistibû. Wê xontekî reşî bi deqên sipî û di jor ra jî îşligekî gewrî bi şivên reş lixwe kiriwû.

Tomefileke sipî ji alîjorê gund da hat li ber mala Çeko dawestî. Jê da du meri pêya bûn. Yekî foterê li serî bû. Di perikê çucika yê ku bi kenara foterê da kiribû, xuya dikir ku ewî Elmançî ye. Yê bi foter silav da û ji Zênewê pirsî got,

– "Xwangê, va mala Hec Mistefê ye?" Navê Çeko yê esil Hec Mistefa bû. Zênewê serê xwe berjêr hêjand, di ber xwe da got,

– "Erê." Ew bi lez meşî çû hun durê malê, xewer da Çeko:

– "Keko mîvan têne mala me"
– "Kî ne?" Çeko lê vegerand.
– "Nizanim, du kesen yad in, li te pirsîn" Zênewê cewab da.

– "Xêr e îşalah, de ma werin hûndûr" Çeko got. Zênewê ode berhev kir, paşê derket û bange'mîvanan kir, ew birin odê Çeko.

Ji xal û xatir pirsînê û çay îkram kirinê şûn da, Çeko pirsî got,

– "Xer e, şer e, hun kî ne, ji ku têne, mirazê we çî ye?" Yê bi foter şor helna got:

– "Navê min Ehmed e, ez ji xelkê Meletyê me. Va î ku li hêlê min rûniştîye, hevalê min e, navî xwe jî şsiv e. Bi îznê te, ez hal û heqata xwe û sebaba hatina xwe ya vira bibêm. Bi tehmîn, bîst sala berî vê bû. Tu yê ef bikî, min pars dikir. Ez rê ji gundê Meletyê dihatim gundê Konîyê, min berhev dikir. Rojekê, ez hatim gundê we. Wexta xermana bû. Ez hatim ser xermanê te. Te tu tişt neda min û bi ser da, te ez dame ber pîna û qewitandim." Mêrikê xerîw dest avête çaya li ber xwe ku jê qultekê vexwe. Va ji Çeko ra bû fersend, wî şor helna, lêbîlem xuyeke sar li piştê ketiwû, got,

– "Gotina te rast e, min kesên parsek ên ku ne seqet bûn di qewitandin, tu yarmetî nedida wana. Ezî huro jî di vê fikrê da me. Lê lê xistin û zêf kirin ne baş e. Heşên hîngê bûn, qusura min ef bike."

Dû ra, Çeko bi xwe da ket. Ew û mîvan bîstkê bê deng man. Heş û aqilê wî çûne ser demên berê yên ku lê va serpêhatîya qewimîbû. Panzdeh-bîst sal di ber vê bû. Wexta xerman helnanê bû. Dora helavtinê hatibû loda

gênim a paşî ye. Berî berbangê, Çeko bi lawê xwe yê mezin, Hesen va helkiştibûn ser loda gênim, ew heldiavêtin. Bo xerman helavtinê ba gerek e. Ew jî li havînên Anatolîya Navîn pirr kêmtê, tu yê bibêjî, ewî xwe diêfşînê. Lewma xermancîyan xwe didane benda bayê siwe ê berbangê ku ji axzê borêz da dihat. Paşê, wextê ku ro qasî bejna merivekî an du merivan bilind dibû, bê diterikand. Devdevê evarê jî tenek ba dihat.

Çeko û lawê wî loda gênim bi nivî helavtibûn. Wexta ro helat û qasî bejna merivekî bilind bû, bayê borêz terikî; êdî ew navber bi navber û tav bi tav dihat. Lawê Çeko, Hesen hespên ku li ser kuça ulêf ork kiribûn, ji orkê filitandin, ku bibe ser kanîyê avde. Çeko yawe dawû ser jûnîyan, li ser lodê ya ku bi nivî bûbû, rûniştibû. Wî, mîna pisika li benda mişk sekinîbû, xwe dawû benda tavek ba. Cixarek vêxist û du-sê cara kûr kişand. Boyî ku bi hatina bê bihêse, wî xwelîya cixarê li ser çengê xwe yê çepê velo kir; çeng rind vekir, mîna têxt dûz kir û mêla xwe dayê. Xwelî di şûna xwe da qet nelivî. Tê bigota bê yî xwe li kerri naye. Ji hêlekê da jî, wî li firîskîyeke kûr dixist. Dengê firîskîyê mîna yê pifêkirina ar vêxistinê dihat. Hîngê bi firîskîyê bange bê dikirin. Wî zemanî, gundîyan îna dikirin ku ba xwe li dengê firîskîyê digre tê. Li navberkê, tavek ba hat û xwelîya cixarê a li ser destê Çeko da ber xwe bir. Çeko bi lez rawû ser nigan û dest bi helavtina lodê kir. Her ku wî yawe ji lodê tijî dikir û berjo heldiavêt, dû ra, ji alîjor da, hewên gênim "Xiş xiş xiş" li ser cêca gênim a sorçequer

diweşîn. Ji weşîna gênim pêçkê şûn da, li aljêr, ka bê deng li ser loda kayê dadinîst. Kaya pirr hûrik jî pêçekê dereng, di jêr loda kayê ra, li ser herdê belaw dibû û diket. Herdê ku kaya hûrik û sivik lê danîstibû, weqasî nermik sîsik û xûşik bû, wexta meriv pêxas pê lê dina, tê bigota, ewî pê lê xalîkî gewr û herîrî dinê.

